




# BERXWEDAN

BERXWEDAN JÎYAN E

Hejmar 3-4

Heziran-Tirmeh-1983

Biha: 5 Skr.



## TÊDAYÎ

Şerr: dibistana bilind ya ku gel tê de  
derbas dibe ye

2

Endamê Komîta Merkezi  
Mehmet KARASUNGUR û şervanê  
PKK İbrahim BİLGİN şehid ketin

3

Bidarvexistina 35 şervan û reberên PKK  
ew ê bibe binxistina wê ya Kurdistanê

4

Derheq mahkemen PKK de biryar dan

5

Xelekên katlamê li zindanên Diyarbekir

6

Dawa PKK: dawa serxwebûn û azadiyê ye  
7-8-9

Cunta faşista qolonyalist  
erişê Kurdistan a Başûr kir

10

Şerrê di navbera hêzên dij-rejima Îraq  
divê bêyi rawestandî

11-12

Hevpeyvîn bi Anita GRADIN re

13-14

TİYATRO -2-

16-17-18-19-20-21

Diroka gelê me bi bingeh,  
kaniya çanda wê dewlemend e

22

Zman û wêje ya nivîsi  
23-24-25

## TİDSKRİFT BERXWEDAN

Utges av

Kurdiska Demokratiska Riksförbundet

\*\*\*

HS Offset

\*\*\*

Konto No: 92 16 25 - 0

★

Berpîrsiyar

MERWAN

★

BERXWEDAN

Kovara Kurdi

Xwesî: Federasyona

Demokrat ya Komelên Kurd li Swed

★

Navnişan - Adress

c/o Kurdiska Bockafet  
David Bagares gat. 12 nb

111 38 Stockholm

SWED

# ŞOREŞ A KURDÎSTAN

*Xwendevanên hêja!*

**K**adroyên şoreşger û gelê Kurdistan bo ro-  
nahîkirina rêya şoreşê gihîştin çekeka bi  
hêz.

*Li gor belavokeka bi navê ŞOREŞ A KURDÎS-  
TAN hatiye belavkirin bi vî navî kovareke ku  
pirtir li ser pîrsgirêkê teorî û sîyasî bisekine,  
ew ê derê.*

**K**ovara ŞOREŞ A KURDÎSTAN ku ew ê di vê  
mehê de dest bi jiyana xwe ya weşînî bike,  
em bawer in ku: wê li hember serberdayîya teorî û  
pratik ya reformîstên burjuvayê biçûk; li hember  
çewtîyên şoreşgerên netewê serdest, ango di der-  
heqê pîrsgirêka netewî û şoreşê de; li hember  
polîtîka hêzên mijoka, bilindkirina zanistîya  
kadro û gelê me; ji bo bûyerên dinê û derdorê me  
bi awakî rastî û şoreşgerî wê xwe bixemilîne û di  
vê rêyê de wê çekeka bihêz be.

*Em gellek kêfxweşin bi daxûyankirina derha-  
tina ŞOREŞ A KURDÎSTAN.*

BERXWEDAN

## ŞERR; DÎBÎSTANA BÎLÎND; YA KU GEL TÊ DE DERBAS DÎBE YE

Hevalên Hêja:  
Destnîvisarên kovara Berxwedan!

Hejmara pêşin ji kovara Berxwedan bi dest min ket. Pîrr dilşa bûm. Çimki: naveroka wê tiştên hêja anibû berbiçav. Hêvidarim ew ê kovara Berxwedan ne tenê li ser pîrsgirêkên Kurdê derveyî welat raweste. Belê, li ser pîrsgirêkên Kurd û şoreşa Kurdistan bi girani raweste.

Ji ber ku baweriyên diji şoreşa Kurdistanê weşandinê, helbet ne tişteki nû ye. Lê, kiraseki nûh kişandiye ser xwe, bi taybetî li Kurdistan'a (Tirkîyê) paş ku rejîma faşîst hate serkar.

Bê guman çareserkirina meselê ne hêsan e. Û bi taybetî di gotarekê tenê de kifşkirin û daxuyandina vê rewşê ew ê kêmbê. Emê du baweriyên çewt yên diji şoreşê deynin berçav. Bawerîya pêşî, berî hatina cunta faşîst di hate belavkirin: a dudiyar paş ku hatina karbidestên faşîst tê belavkirin. Lê, herdu bawerî dikevin yek rêçkê. Rêçka diji şoreşê. Mirov xweş dizanin ku xwedî van herdu nêrinan zû bi zû û bihêsanî ji çewtiriyên xwe venakşin. Mina mirov çewa nikaribe bawerîya mişk bine ku şer bi gelleki ji pisîkê xwirtîre, her wiha bawerîya wan camêran wek a mişk nayê guhartin. Ev yek eşkeretir dibe dema mesela Cebha Niştîmanî tê pêşniyarkirin, ger çiqas ji alî "teorî" xwedî lê derdikevî, lê ji aliyê pratîkê de ben û keleman datînin pêşiyê. Ji ber, Cebha Niştîmanî bi xwe, tixûbên xebatê propegandî derbas dîke, û her wiha hazîrkirina şoreşê li dar dixê.

Ma ev herdu ditînen hanin bersiva rizgarîya Kurdistan!!!

Ditîna pêşî: ev e ku di pêvajoka dirokê de bi pêşketina aborî hêdi-hêdi civat ji ber bi pêş ve diçe. Çimki: dirok ber bi paş ve naçî. Û her wiha pîrsgirêkên civat, welat û millet tê çare-

serkirin!! Li gor vê nêrinê, metodek ji xebata xwe ya siyasî re danin, ew ji ev bû: pêwîst e xebatek "demokratî" bê kirin, di rêya parlamento, kovar û komel û hwd. Yanî bi kurtî xebatê bê kirin lê ji sinorê daxwaziya burjuvaziya serdest dernekeve. Û bi rayanina wê bi. Ma ev rêya serxwebûna Kurdistan e? Pêşketin ji hêla aborî de çî bi xwe re tine? Ma mercên serxwebûna siyasî, pêşveçûna aborîyê, yan mercên pêşveçûna aborî di xizmeta welat de serxwebûna siyasî ye?

Pêşketina aborî wek hati ye zanin, pêşketina du faktora ye. Kar û sermaye. Pozberî û dijayeti li navbêna wan her û her heye. Û ku her aborî ber bi pêşve diçî, dijayeti gurtir û xurtir dibi: ta ku sermaye hilweşi. Lê, dîbi hêzên şoreşger amadebin ji bo şoreşê. Çimki: sermaye bi giştî bê şoreşê nehati ye hilweşandinê.

Ger li der barê metodê bê gotinê, pîrr metodek xebata siyasî hene. Lê bilindtirî metoda xebata çekdari ye. Ji ber vê divê xebat, sinorê xebata komel û kovaran (ku bi raya dewletê derdikevin) derbas bike. Ji ber ku: bi metodek razibûna burjuvaziya Tirk be Kurdistanê rizgar nabe. Her weha, ji alîkî din ve şertên pêşveçûna aborî, di xizmeta welat de serxwebûna siyasî ye (lê helbet ne tenê serxwebûna siyasî). Çimki: aborîya Kurdistan di xizmeta monopola de ye.

Ditîna duduyan: herweki me li jor bi kurtî gotibû ku, ev ditîna min a pêşiyê û di gîhên yek rê. Lê bi awakî ditir. Lê, çewa?

Dibêjin ku: divê şoreşek li Kurdistan li dar kevi. Çimki: bê şoreşê Kurdistan qet rizgar nabe. Lê, iro, mercên şoreşê li Kurdistanê peyda nabin (hêviya me heye ku ew ê keys bidest me kevi, di hejmarên pêş de û bi firehi ve yekê binivîsinin). Yanî e ku li wan guhdar biki, ji wan tédighê ku bi kêmanî kesên nuha dijin ew ê şoreşa

Kurdistan û rizgarîya wê nebinin. Pas dehên salan dibi ku şoreşek li Kurdistan'a Bakûr pêkevi. Ji ber vê ji, mesela şoreşê ji alî pratîkê berçav nagrin. Eşkere ye ku herdu nêrin ne dûrî hev in. Yek şoreşê naxwazi. Û e din ji şoreşê "dixwazi", lê pîrr li dîr dixi. Bi qeysa ku tu kar iro ji alî pratîkê de neki, yanî herdu ji nakin. Lê, yek dibêje ez nakim. Yê ditir li dor wê dizivîri ji bo ku neke. Lê ki bixwaz, ki nexwazi; şoreş, roj bi roj nêzîktir dibi û milletê Kurd xwe ranagri li hêviya wan.

Mirovên amanceki deynin pêşiya xwe û metodek wê amancên pêkneynin ew: ne xwedîyê wê amancê ne. Yanî hêzên ku serxwebûna Kurdistanê ji xwe re dibin, amanc û xwe ji bo şoreşê amade nekin ew hêzanan ne xwedîyê serxwebûna Kurdistan in.


Gere em nazibin û ji bir nekin ku: ceng û şer dibistan in, gel tê re derbas dibin. Dibistanên pîrr zor û dijwar in. Di proxrama vê dibistanê de heye ku dijmîni ji caran bi serkeve û di wê demê de ew ê bi sedan şoreşgeran li sêdaraxin, û hemû rengê zordariyê bikar binin. Lê dibistaneke yên ku li diji, derbasbûna wê ne, ji ber zor û dijwariyên wê, tenê e bê mejînin. Çimki ev dibistana han zahmetkêşan fêrî şerr û cengê dîke. Fêrî şoreşeke bi serketî dîke. Hêviya me ya mezin ew e ku herkesê şoreşger û welatperwer ji nerastîyê vekşin û van çewtîyan ji gel dîr bihêlin. Ev çewtî bîminin rût û tazi weki şevşevokê.

Bi bendekî helbesta seydayê mezin Cigerxwin vê nivîsandina xwe dawî pê binim. Pîrr sipas li gel silavên germ bo destnîvisên kovara Berxwedan û hemû xwendevanên wê.

*«Ey xoriên civanmêr, bese bîfêde ye ev rev destê xwe bidin hev Ronahi li pey tari ye, tim roje li pey şev em nayêne kuştin»*

Hevalê we CENAN

## ENDAMÊ KOMÎTA MERKEZÎ MEHMET KARASUNGUR Û ŞERVANÊ PKK ÎBRAHÎM BÎLGÎN ŞEHÎD KETÎN



**Mehmet KARASUNGUR**

Ji sedemên taybetên derva û hundir berberî û dijberîya bê fêde ku zerarê digihîne tekoşîna gel ji bo ku bêyî rawestandî, têkili û yekîtiya hêzên pêşverû û welathîz avabibe gelê Kurdistan divê oxirê de du lawên xwe yê mîrxas wundakir.

Li gor agahdarîyê gihane rojname me roja 2 ê Gulanê 1983a ji sazkarê PKK û endamê KM Mehmet KARASUNGUR û şervanê Partiyê İbrahim BÎLGÎN li hêla çiyayê Kandilê bi berikên hêza Yekîtiyê Nîştîmanî Kurdistan şehîd ketine.

Bi alemê tê zanîn ku ji mehan ve berberî û şerê navbera cehba El Vetan Demokratî Iraq û Yekîtiyê Nîştîmanî Kurdistan didome û dibe sebebê kuştina gellek şoreşger û welathîzen Kurdistan.

Ji bo têkili û dîtina piştgirîyeka rast bi van hêla tê bigihîne ji berê ve di navbera hêzên welathîz û pêşverû û hêzên demokrat û şoreşger da Mehmet KARASUNGUR xebatan pêkanîbû, kesên van hêla dibû û di vi ali de


xebatên bingehî pêkanî bû.

Ji bo ve berbenyê rawestandin, hêzên hember hev çek bikartûnîn li hemberê diktatoriya Seddamçêken xwe biteqînîn Mehmet KARASUNGUR û İbrahim BÎLGÎN xebatan pêkdîanîn. Bi vê amancê dema li karargaha PKÎ ku civin ji ali hêzên çekdarê YNK ve têgiştin diberberîya bûyerê de şehîd dîkevin. Disa di vê sergirtinê de ji endamên KM ya PKÎ û 40 endam û şervanên ve partiyê ji tene kuştin.

### EV BERBERÎKÊRÎKÎTÊN

Bi tekoşîna hêzên şoreşger û pêşverûyên Rojhelata-Navîn, hêzê Iraq û Kurdistan'a Başûr, û ji ber şerê Iranê cendirmeyê emperyalîzm, diktatoriya Seddam hatîye ber ketinê.

Hoyên hundur û derva ji bo binxistina sazûmana Seddam erînine. Lê ji ber kêrnehatîna hêzên hember, pêknehatîna yekîtiya çarenîn, ji xeynî van ew berberî şerên tesîr li hêzên hêlê,



**İbrahim BÎLGÎN**

Kurdistan û Iraqê dîkin, bêberpîrsiyariya mezin, berberîya hundir diktatoriya Seddam dijine.

Ki bi çî awayî, li ser çî pergali nêzdibe û dibe sefgirtiyê bûyerê, ji van pêkhatinan, ji tewrê jiyandomandina diktatoriya Seddam berpîrsiyarin û li pêş dirokê suçên giran pêktînin.

### BERPÎRSIYARÎYEKA GİRAN LÎ MÎLÊ HÊLÊN ŞOREŞGER Û WELATHÎZ E

Hêzên dilxwazên yekîtiya siyasi û netewa Kurdistan in dibî ku hember tewra pêkanînan hêlîti, eşîrî hwd. ku yekîtiya nav me dipêjîrînin, dijîminahî û benditî diafirînin pêwîste ku tekoşîn bikin, û li sefên daxwaza salan sefê yekîti û hevkarîya gel cih bigrin.

Di vê oxirê de dema tekoşîn domandine Mehmet KARASUNGUR û İbrahim BÎLGÎN û partiya wa PKK rêya me ronahî dîke. Tu hêz û xebatînikare yekîti û tekoşîna gelê Kurdistan rawestîne.


## BÎDARVEXÎSTÎNA 35 ŞERVAN Û RÊBERÊN PKK EW Ê BÎBE BÎNXÎSTÎNA WÊ YA KURDÎSTAN'Ê

Dawa Diyarbekir li Örf-i İdara Diyarbekir, dadgeha leşkeri, di 13 Nisan'ê 1981 de destpê kir, biryar di 25 ê Gulan'ê 1983 an de daxuyan bû. Derheq 35 şervanande biryarê bidarvexistinê, derheq 28 an de mubet hatiye sitandin. Ji ber emr'ê wan piçûke derheq 10 an de biryar guhuni û 24 sal dane van şervanan. Derheq 33 girtiyên şoreşger de nevbêra 3-24 salan de ceza dane 178 kes ji hatiye berdanê.

Bi biryarên bidarvexistina 7 şervanên dawa Birecik'ê roja 3 Gulan'ê hejmara biryarên bidarvexistina gihişûye 42ya.

Piştî dem-dagirtina dadgehê ku biryar daxuyan bû, şervanên şoreşê bi yek dest û yek dengi şiarên şoreşgeri, hember dadgehê tînin zman û daxuyandikin ku dadgehan qolonyalist ji bo biryarsitandinê nasnakin. Li hember vi tewrê berxwedan û tevgera bilind heza qolonyalist êriş dike ser şervanan, gellek şervan birin dibin. Şervanan dadigrin erebên pola û ji dadgehê durdixinin. Dûra tu hay û agahdari ji van şervanan daxuyan nabe. Lê, li gor daxuyanbûnên hêla girtixanê ji ber berxwedanê didominin, zilm û îşkencên giran li ser van şervanan pêkdibin. Disa li gor agahdariyê maliyên girtiya dibin zerpên giran dane.

Ev zilm û zerp li ser gel tê meşandin û daxuyanên dema êrişê Kurdistan'a Başur pêk hati eşkere xuyan dida ku heza qolonyalist di tirseka



giran daye. Nexasim bi êrişa rojeve eşkere ye ku heza qolonyalist dixwaze bi helên din ve bal bide kişandin û tesira biryaran ji ser gel û navnetewa betal bike. Lê, pêkhatinên rewşê ve amancê pêkaninên heza qolonyalist bervaji guhartûyê, bi girani rewşa Kurdistan û heza PKK bal kişandiyê.

Gellek zelal e, êriş ew ê hemberî û tekoşina gel geştir bike. Ew dema hember darvexistinan rewşa bédengi zû ve hatiye bihurandin, bi xemla hemdemî û rêberiya rêxistina berxwedanê gelê Kurdistan sebebên wundakirinên mezin be ji daye nişandan ku ew ê tekoşina serxwebûna Kurdis-

tan bê binxistinê bê domandinê.

Roja 24 ê Gulan'ê 1983 biryarên darvexistinê derheq van şervanan de hatiye dayinê.

Riza ALTUN, Şukru GULMUŞ, Muzaffer AYATA, Celalettin DELİBAŞ, Musatafa KARASU, Bedrettin KAVAK, Mehmet TAKİR, Abdulsemet TEKTAŞ, Selahattin ŞİMŞEK, Celaf BAYMİŞ, Hamit BALDEMİR, Hidir AKBALİK, Mehmet TANBOGA, Mehmet CANYÜCE, Mehmet Emin KESKİN, Ali YENER, Kemal AKTAŞ, Abuzer DEHŞET, İrfan GULER, Suleyman GUNEYLİ, Ali KİLİÇ, Ramazan ÖDEMİŞ, Salih OGAÇ, Zulfikar TAK, Halil UCUT, Ali YAVERKAYA, Feyzi YETKİN, Abbas YOKUŞ, M. Fahri ÇİFTKUŞ, İzzet BAYKAL, Yılmaz UZUN, Alaattin AKTAŞ, M. Emin GÖKDEMİR, Cemal ARAT, Cuma KUYUKAN.

Şervanên derheq wan de biryarê mubet hatiye sitandin ji ev in:

Selahattin EFE, Resul YAŞAR, Eyup ACAR, Harun BIÇAK, Abdulkadir ATIL, Mehmet ÇAT, Osman GULTEKÇE, Ömer Nihat KAYA, Hasan Huseyin KARAKUŞ, Ahmet KİLİÇ, Abdurrahman SEVGAT, Emin YAVUZ, Hamza YAVAŞ, Fettah YİĞİT, Ahmet KOSANLIOĞLU, İlhami ADIYAMAN, Aptullah KANAT, Mehmet GİRGİN.



## DERHEQ MAHKEMÊN PKK DE BÎRYAR DAN

### MAHKEMÊN BÎRECİK

3 Gulan'ê 1983an de mahkema refa Bîrecîk ku li Diyarbekir di hate domandinê gihiştê dawiyê.

Ji nav 61 kesên derheq 7 şervanên cengê de biryarên bidarvexistinê, ji bo şervaneki biryarê mûebbetê hatiye danê. 28 kes tene berdan, derheq 20 şoreşgeri de di navber pênc û se salan ceza tê xwestinê.

Şoreşgerên derheq wan de biryarên darvexistinê hatiye sitendin ev in: Kemal Tekgöz, Salih Segiz, Musa Aslan, Mehmet Yalçın, Ahmet Öğretmen, Hasan Çepik û Mustafa Çepik. Derheqê Tahir Ertürk de mûebbet dane.

### BÎRYARÊN DERHEQ MAHKEMA NAVÇEHÎ DE WÊ VÊ HEFTÊ DAXÛYAN DÎBE

● *Bidarvexistina 99 şervanên girti tê xwestin!*

Ji destpêka roja 13'ê Nisan'ê 1981 ve ku li mahkema eskerîya òrf-i idarê


şoreşgeran de li gor benda 125an biryarên bidarvexistinê, ji bo 285a di navbera mûebbet û hepsa 3 sal ceza tê xwestin. 136 kesên re berat tê xwestinê.

### DÎ MAHKEMA ENTAB'Ê DE PÊVAJOYA PÎRSÊ XELAS BÛ YE!

Derheq 7 kesên de biryarên bidarvexistinê tê xwestin. Li òrf-i idara qolordiya 7. Mahkema eskerîya Entab'ê dema pîrsê gihiştîye dawikê. Ji 550 girtiyan derheqê heft kesên de di navbera 4 û 20 salan ceza tê xwestinê. Piştî rûniştina mahkema 11.4.1983a li gohr daxûyana bûye, mahkeme derheq kesên besebeb ku girûbûne biryarê berata 67 kesa dide û derheq 2 şoreşgeran de biryarê girtinê didin. Ku mahkeme li qolordiya 6. komitaniya òrf-i idarê didomiya refa Edenê tevi vê dikin pê de daxûyan bû ku ew ê li Îçel û Hetay'ê mahkeman bidomin.

Roja 11.4.1983an de derheq van kesên de biryarê beratê hate daninê. Hatice Kaya, Hatice Akteke, Huseyin Sarıkaya, Mehmet Yaşar Ateş,

Akdaş, Kureyiş Yorulmaz, Kazim Gulmez, Mehmet Nuri İlhan, Mehmet Çabuk, Ali Kuşoğlu, Ali Kale, Abdullah Hoşgören, Ahmet Kok, Done Melamin, Fatma Esanir, Fatih Ruştu Zorluyıldırım, Hayri Çelik, Huseyin Poyraz, Hasan Özcan, Kazim Atalay, Mahmut Yıldırım, Mehmet Gülnay, Mehmet Şentürk, Muhiittin Ateş, Ökkeş Şimşek, Ömer Kaya, Salman Nacakgedigi, Sait Emir, Vakkas Akboga, Aysel Dogan, Cindi Aslan, Döne Yıldırım, Done Gölgeci, Fatma Carman, Gulşen Demirdelen, Guluzar Uzundere, Hayriye Konar, M. Hanifi Bayindir, Hösne Contay, İnsaf Çetinel, Kazim Agaaslan, Kadir Çam, Mehmet Nuri Taşkin, Mehmet Akboga, Mehmet Uludağ, Tagip Kordevci, Şehnaz Azizoglu, Şiho Muslum Ata, Yakup Beydili, Yusuf Turunç, Zohre Owayolu, Gulşen Övezoglu, Ahmet Karabiyik, Bekir Bozkurt, Huseyin Oguzcan, Mehmet Ali, Osman Çinar, Ömer Nacar, Salih Uçar, Tahir Sapan, İmam Balaban, Osman Ateş, Naci Hacideniz, Musa Sabuncu, Muslum Gül, Munire Turan, Ali Özkan, Cafer Aykanat, Eşref İnnat, Mehmet Emre.



didome biryarê derheq mahkema navçeyi de wê di vê hefte de daxûyan bibe.

Ji 570 şervanên PKK derheq 99

Zeliha Umurcan, Zöhre Umur, Ahmet Degirmentaş, Ali Sumbul, Ali Can, Ali Taner, Celal Guzel, Haşim Guzel, İsmail Sezerkan, Kemal

Talat Özcan, İzetün Fazlınar, Ahmet Uçar, Cennez Uzundere, Mehmet Yetmez, Hacı Ateş.

# XELEKÊN QETLÎAMA LÎ ZINDANÊN DÎYARBEKÎR

Ji bo girtiyên PKK ku di bin îşkence û zerpên dijwar de radiwestin biryarên bidarvexistina wan ji mej ve destpê bûye. Ji sedemên ve yekê, biryarên bidarvexistinê ku hatine daxuyan kirinê ji bo kifşkirina hejmarên bidarvexistinan ev daxuyan rasûyê nade eşkerekirin. Lê, ji neûca pêkaninên hovîti, nemiroviya qolonyalista faşist, çend kes hatî kuştin bi hejmarek zelal ne kifşe. Lê, rasûyek heye ku girtiyên PKK, esirên şer li ber qirkirina ne. Me dem-bidem qirkirin û kuştinên li ser agahdarbûna xwe daxuyan kir. Ev rojen li ser hev biryarên darvexistinan ten sitendin û li berçave ku ew e pêkaninên van neze, em e navên kuştî û yên derheq wan de biryar hatîye sitendinê ku bidarvexistinê ve rêz bikin.

Navê şervanên şoreşê ku di îşkence û qirkirinan de derheq wan'an biryarê kuştinê pêkhatîye ev in;

Aytekin TUĞLUK	Eleziz	14 Êlûn 1979
Sait ŞİMŞEK	Entab	1980
İbrahim KURT	Edene	1980
Ali EREK	Diyarbakir	Tebax 1980
Remzi YALVAÇ	Diyarbakir	1981
Sabri KANDEMİR	Diyarbakir	1981
Abdurrahman ÇEÇEN	Diyarbakir	1981
Ahmet DEMİR	Diyarbakir	1981
Vakkas DOĞRU	Araban	1982
Hasan (Hüseyin) AKAR	Adana	1982
İbrahim PAYDAŞ	Diyarbakir	1982
Şaban	Diyarbakir	1982
Asker DEMİR	Ankara	1982
Mazlum DOĞAN (Endamê KM ya PKK)	Diyarbakir	21 Adar 1982
Ferhat KURTAY	Diyarbakir	22 Adar 1982
Eşref ANYAK	Diyarbakir	22 Adar 1982
Kemal PİR (Endamê KM ya PKK)	Diyarbakir	8 Êlûn 1982
M. Hayri DURMUŞ (Endamê KM ya PKK)	Diyarbakir	8 Êlûn 1982
Akif YILMAZ	Diyarbakir	8 Êlûn 1982

Yên derheq de ji berê ve biryar hatî sitendinê.

Mehmet KARA	Nisan	1982
Dursun Ali KUÇUK	1 Çile	1982
Mehmet SAVAŞ	1 Çile	1982 (biryarê mubet)

Di dawayên PKK de ku ji 5.000an zedetir welathiz û şoreşger tene mahkemekirin bi hemû pergalên girtinê nezîk 600i biryarên darvexistinê têyi xwestin. Ku dawa refa navçe li Diyarbakir pêkdihat û didomiya ve dawê bi gellek refi ji hev parvekirine

Ev dawayên refê veqetandi ev in;

- a- PKK dawa Refa Navçe.
- b- Wêranşehir.
- c- Halfeti.
- d- Ürfa-Navçe
- e- Ürfa-Birecik.

- f- Ürfa-pêve.
- g- Ceylanpınar-Bozova.
- h- Batman-pêve.
- j- Mêrdin-pêve.
- k- Eleziz (Diyarbakir).
- l- Dawayên Edenê, Hatay, Mareş, Entab û Adiyaman ku di qolordiya 6. komandaniya örf-i idarê de tene ditin.
- m- Dawayên Erzincan, Erzerom, Qers û dawayê pêve di qolordiya 9a komandaniya örf-i idarê de tene ditin.
- n- Dawayên Eleziz û dawayên pêve di qolordiya 8a komandaniya örf-i idarê de tene ditin.

Di dawayên neticê wan 3 Gulan 1983 û 25 Gulan 1983a daxuyan bû yê Birecik û Diyarbakir'ê ku derheq wan de biryarên mubet û bidarvexistinê tê xwestin;

## DAWAYA BÎRECİK

### MUEBBET

Tahir ERTÜRK

### BİDARVEXİSTİN

Kemal TEKSÖZ  
Salih SEGİZ  
Musa ASLAN  
Mehmet YALÇIN  
Ahmet ÖGRETMEN  
Hasan ÇEPIK  
Mustafa ÇEPIK

## DAWAYA DÎYARBEKÎR

### MUEBET

Selahattin EFE  
Resul YAŞAR  
Eyup ACAR  
Harun BİÇAK  
Aptulkadir ATIL  
Mehmet ÇAT  
Osman GULTEKÇE  
Ömer Nihat KAYA  
Hasan Hüseyin KARAKUŞ  
Ahmet KİLİÇ  
Abdurrahman SEVGAT  
Emin YAVUZ  
Hamza YAVAŞ  
Fettah YİĞİT  
Ahmet KOSANLIOĞLU  
İlhami ADIYAMAN  
Aptullah KANAT  
Mehmet GİRGİN

### BİDARVEXİSTİN

Riza ALTUN  
Şukru GULMUŞ  
Muzaffer AYATA  
Celalettin DELİBAŞ  
Musatafa KARASU  
Bedrettin KAVAK  
Mehmet TAKİR  
Abdulsemet TEKTAŞ  
Selahattin ŞİMŞEK  
Celal BAYMIŞ  
Hamit BALDEMİR  
Hidir AKBALİK  
Mehmet TANBOGA  
Mehmet CANYUCE  
Mehmet Emin KESKİN  
Ali YENER  
Kemal AKTAŞ  
Abuzer DEHŞET  
İrfan GULER  
Suleyman GUNEYLI  
Ali KİLİÇ  
Ramazan ÖDEMİŞ  
Salih OGAÇ  
Zulfikar TAK  
Halil UCUT  
Ali YAVERKAYA  
Feyzi YETKİN  
Abbas YOKUŞ  
M. Fahri ÇİFTKUŞ  
İzzet BAYKAL  
Yılmaz UZUN  
Alaattin AKTAŞ  
M. Emin GÖKDEMİR  
Cemal ARAT  
Cuma KUYUKAN

## DAWA PKK; DAWA SERXWEBÛN Û AZADÎYÊ YE

Mahkema 572 şervanên cengê, tekoşerên PKK di mahkema leşkeriya Diyarbekir de bi biryarên darve-xistina 35 şoreşger û mûbeta 19 tekoşeran, gihîştê "dawikê". Netîca mahkema ku ev ji du salan zêdetire ku tê domandinê, mane û giraniya ve netîcê bi hemû taybetan ve li holê ye.

Hemû mahkemên PKK û nexasim mahkema-Navçe li hember qolonyalista bû navçe şervanan û dozparêzi û tekoşina serxwebûnê. Taybetên mahkema daxuyan kirine ku; di nav şerê rizgariya netewa û domandina şerê serxwebûna gel û welat de, dijmin çiqas har û êrişbaz be, çiqas bi hêz û dijwar be, di vi şerê dijwar de, gelê şervan û biryarvanê tekoşinê hember dijmin bin nakeve. Mahkemên PKK bûne nişana binneketina vi şerî û bûne sembola serfiraziya gelê Kurdistan. Bi van hemû taybetên xwe mahkeme gihîştine qeysa ku hêzên qolonyalist, berdevkê wê, pirsîkirinê ji xwesipariyê. Bi hebûn û rêberiya îdioloji û politîka rêxistina karkera, parazvanên ve nêrinê rêya serxwebûn û azadiyê firehkirine û rêya serfiraziyê ji niha ve daxuyan kirine.

Ev dawayên diroki ne. Lewra ji qurna salan û nexasim 60 sale ku tune kirina netewa qolonyalîstan daye pêşiya xwe di van mahkeman de qolonyalista Tirk û hovîti û zilma burjuvaziyê xwînxwar hatiye daxuyankirin û pîrsa van yekan jê bû ye. Ger sedsalan bi dome ji ev mahkeme bûne nişana ew ê gelê Kurdistanê di rêya serxwebûnê de vi nîrê nemirovî hilweşîne. Û mahkeme ji ve amancê re bûne pîrekî.

Ev dawayên bi heq'in mina şervanî û biryarvaniya hemû gelên azadîxwaz û parasvanên serxwebûnê; gelê Kurdistan jî, daxwaz û hêviyê xwe ya serxwebûn û azadiyê di van mahkeman de geştir kiriye. Û hêrs û hemberiya dij qolonyalîstan berçav xistîye.

Ev dawa, bin nakevin; lewra ev şerê li ser mafî pêk tê, tekoşina ku hatina gel daxuyan dike, di hemû pêvajoyên dirokêde kifşbûye ku herdem serfirazbûne. Ku hêzên serdest bi zilm û zerpê cihabinin li hember tekoşinê gelan ji binketîne nefilîtine. Ji bo ji bin nîrê qolonyalîstî derbîkeve

gelê me yê şervan di vi şerê xwedi maf de ji niha ve bin nakevi û serfiraziya xwe dide nişandanê.

Dawa ya PKK ku bi maf, binneketî û dirokiye dawa ya gelê me, dawa ya serxwebûn û azadiya gelê Kurdistan e. Ji sedemên van yekan ev dawa ne tenê di derdorên mahkeman de û ne bi mahkeman gihîştîye dawikê.

---

### DAWA PKK DAWA SERXWEBÛN Û AZADÎYA GELÊ KURDÎSTAN E!

---

Dawa PKK hê ji afirandina Tekoşina Serxwebûna Kurdistan ve destpê bûye. Bi avakirina nîrê qolonyalist burjuvaziyê Tirk li ser gel û welatê Kurdistan hebûna xwe avakirîye û tune kirina netewa Kurd amanca yekemin daye pêşiya xwe. Bi hatina salên 1970 ve di vi ali de gellek serfiraziyan pêkani bû. Lê, ezm û ruhê ku têgihîştîye ve yekê bû bi qetliam û nefî û zerpê ji holê rakirîye xistîye gorê. Bi ve gumana pirsîrêka Kurdistan binxistîye li ser Kurdistanê hesp dilistîkanda. Bi rastî ev rewş bi wi awayî ji lê ray dihatê kirinê. Ku; hebûna gelê Kurd di nav cihanê de jibir ve hatibû kirinê. Ev rewşa li holê û ku burjuvaziyê Tirk li cihanê ji dida xebitandinê bi rastî pêvajoya ber tunebûnê bû.

Ji ali emperyalîzmê ve ev dawayê ku hatibû girtin, bi gumana ketîye nav tarîtiya dirokê û hew jê derdikeve. Mina burjuvaziyê emperyalîzm ji pirsîrêkek wiha naznedikira. Ji ali gelê me va ev pêvajoya dihatê jiyandin bi herawahi neerîni bû. Çînen serdest ji berê ve ve rewşa xedar hebandibûn. Heta wan ji burjuvaziyê Tirk diwartir ve rewşê kardiyanin û li ser ve rewşê jiyandidomandin. Ev ronakbîrên dozparêzên gel di rewşek hewqas neerîni de bûn ku ne hêza hemberiya ve rewşê bikemilînin, ew di derdorên xîza dijmin de tevger girêdidan.

Lê ev pirsîrêka ali emperyalîzmê û burjuvaziyê Tirk ve hatiye hildanê helbet ev ji ali gelê me ve ne wilo bû. Kedkarên gelê me di nav ev tariya vegirtî de hebûna geli dijiyan û jiyana geli didomandin. Lê ew ê dengdana ve rastîyê çewa û bi çî bigihîya cihanê. Û

ew ê çewa bi hata bilindkirinê. Ku bi hemû cihan û ta ji gellek aliyan bi gelê me ji dabûn jibirîkirinê ew ê ev pirsîrêk çewa derbiketîya meydanê.

Tenê dozdarê ve pirsîrêkê him ji ali doza netewî û him ji ali gihandina pêvajoyê hemdemê tenê çîna karkerên Kurdistanê bû. Bi sala 1970 bi bingehîrtina îdioloji amanca karkeran li ser bihgenê karkerên Kurdistanê refek komunist bi amanca afirandin û derxistina ve pirsîrêkê şer destpêk anibûn. Hê ji destpêkirina vi şerî, bi gavavêtinê destpêki ve hebûn û doza ve pirsîrêkê ku ew ê di rewşa ronahî de bigihîje serfiraziyê rûpelên nûjen vekirin. Û binneketîna ve pirsîrêkê daxuyan kirin. Rastîya ku iro li ser hebûn û mahkemên PKK eşkere ne bi rastî ji Tekoşina Serxwebûn û Azadiya gelê Kurdistan bi tekoşin, hebun û rêberiya PKK zelal bûbû. Û ev hê ji wan salan ve destpê bûbû.

---

### EMPERYALÎST Û QOLONYALÎSTÊ TÏRK BÎ DERKETÎNA DAWÊ HEYSÎ Û DÏJWARBÛN

---

Ku dawê dabûn jibirîkirin û gumana wan da tunebûbû, dawa û pirsîrêk bi hêz sitendina hemdemê bi destê karkerên Kurdistan ku derkete meydanê emperyalîst û hêza qolonyalist şaş û heyrî man. Bi rastî ev hemû cihan li ve şaşbû. Bi gumana ve pirsîrêkê hildabûye pêvajoya ku pirsîrêk bi pergalen kemilandi hember hêza qolonyalist afirî di ve rewşê dijmin di nav şîkên giran de ma û êşên giran kişand û li hember ve dozê tewrên xwe yê diroki disa nişan da. Hê dema çîrîsk veketûbû ku li hemû derdorên ronahî nedabû bi êrişê ew ê kaniya çîrîskê bitemirine Hogir HAKÎ KARER qetilkir. Bi vi awayî biryar ji destpêki ve li ser tune kirinê hatibû danê.

Hember biryarên tune kirina tekoşin û tevgera rizgariya netewa Kurd, biryarê refa rêber û biryarê gelê me zelal û qatî bû. Li hember îşkence, zerp û qetliam û amanca tune kirina biryarê gelê me bû di nav ve rewşa xedar de bilind kirin û domandina berxwedan û tekoşinê. Ger pişt 12 ê



Êlûn'ê, ger berya 12 ê Êlûn'ê hember hemû êriş û derbên dijwar domandin û bilindkirina tekoşina netewî bû nişana vê yekê. Dihat zanin, dijmin ji bo hîlandina tekoşinê hêza xwe û hemû destkêrên xwe bikar bîne. Ku ji destpêkê ve tevgerên şerî bikar anî. Tenê tetbiqata bi kincê pêşmergan li hêla Hakkari pêkanî, dibê nişana vê yekê. Disa zerp û êrişên ax'a û esîran, kuştinên kuçe û meydana dibîne nişana vê yekê.

Hêzên qolonyalist hember tekoşina netewî, û bi kuştin û bi îşkencan û zerp'ên tazi di amanca xwe da serfiraz nebû pède, li hember tekoşina şoreşgerî şer daxuyan kir. Lewra, di alî pûçkirin û tunekirina ezm û biryarvaniya berxwedan û serxwebûnê de dijmin bêçare ma. Ji 1980 biserkarkirina generalan ev şerê êşkere tê domandinê. Pişt sala 1980, girtin, û bombekirina erd û çiyana, qetliam û îşkencê hepîsxana, zeftgirêdana ser gunda pêk anî... hemû perçene ji vî şerî. Hêzên qolonyalist ji alîki ve tunekirina tekoşina netewî didomînin, ji hêla di ve ta kîlêra gelê me zengîn û ked'a gel daduqurtînin û dest dave hemû destkêrên jiyandomandinê. Di bin nîrê qolonyalistî de bi zerp û zilmê gel dikin ku bimelîsinin ji rewş û qetliamên heps û ji xwe qeysa zerp û pêkanînen qolonyalîstan daxuyan dibê. Lewra: girtî agirên serxwebûn û berxwedanê geş dikirin û bûbûn rêber ji tekoşina gel re.

### BÎRYARÊ BERXWEDANÊ BÎ XWÎNA ESÎRÊN ŞER MOR BÛ!

Bi operasyonên ji bihara 1979an û nexasim ku di sala 1980yî de diwartir domandin gellek şoreşger û welathîzan dagirtin girtîxanan. Tenê ji sedemê Kurdîstanî ne, gundî û karkeran dagirtin qampa. Û li dibîstanan, nexweşxanan û derên dewletê bi rojan îşkencên giran pêkanî. Ji ber girtîxane tîr nehatine, îşkencê û hela zerpê gihandin derdorên gundan.

Di vê pêvajoya girseyên gelê Kurdistan ku ji bir û doza xwe ber bide, zerp û zilmê dijwar pêkdianin. Lê cihê vê zerp û zilmê bi hemû taybetên xwe li girtîxanan didomîya. Hêzên qolonyalist mîna helên di, bi diwari ênş û dijberiyên xwe li ser van refên ku doza gelê Kurdistan daxuyan kirine pêkanî. Hemû nemirovî û hovberiyên

xwe li ser vê helê domandin. Ger bi kuştin, ger ji bi pêkanînen nemirovî dawî ku dev ji bir û baweriyên xwe berbidin, hêzên qolonyalist ji xeyn van pêkanînan bi hemû rengên nemirovî lidarxistî, ji bo tevgera berxwedana sazgarîya Kurdistan pêş nekeve. Ji sedemê vî amanca hov û nemirovî destpêki ve ev yek pêşber girtîyan bû; an ew ê hember dijmin nermok û xwesiparbin, nîrê qolonyalistî bihebînin, an ji ew ê bêne tunekirin. Di vî rewşa dijwar û pêşberîya du rêçan de şoreşgeran rêya jiyane da ber xwe. Lê, ne ew jîyan û rêya jiyana ku li ser xwesiparî û xwedûkirina bir û baweriyê û ne ya jiyana arizî pêk tê, wan biryara jiyandomandinê li ser bingehe tekoşina serxwebûnê û ji bo cangoriya tekoşinê mirina xwe dane berçav. Ew jiyane di hoyên dijwar, rewşa girtîxanan de dijmin bindixine dan pêş xwe. Bi zanebûna ku xwesiparî û melîsandin mirineka rûreş û nemirovî ye esîrên şer bi tewrên biyarî bi xwîna xwe "Berxwedan Jîyan e" nivîsandin.

Bi vî awayî biryarê doza PKK di nav şerê girtîxanan û bi tekoşinê disa ji qatî bû. Û ev biryar bibe sebêbên çî yekan, bilindkirin û domandina berxwedanê bû.

### PÊKANÎN Û BÎRYARKARÊN MAHKEMÊ PERRÊ PÎRSA DÎROKÊ NE

Çewa qolonyalist bi amanca binxistina doz û bir û baweriyê girtîxanan bikar anibin, disa bi destpêkirina mahkemên 13 ê Nîsanê 1981 xebatî dan pêş xwe ku vî ji bikin rewşek binxistina dozê. Lê, ji ber domandina tekoşinê û bilindbûna berxwedanan mahkeme bûne cihgera şoreşger û doza şoreşê û li hember hêza qolonyalist serfiraziyan pêkanî. Çewa bêdad û qeyd û benda îşkence û zerpên girtîxanan pêkanî bi vî pergali tevgera nemirovî di mahkeman da domandin. Esîrên şer, bi zincîran girêdayî dihatin qada mahkeman û li vî derê dibin zerp û zilma lêşkeran da radiwestandin. Her mafên parastina wan tunebû, avukatên wan ji her bîhn dibin zerpên girandabûn. Bi gefên zerp û girtînan ji bo bédengbîminin dibin rewşên diwari de dihiştin. Ji bo paşmanbûyîna xwe zerpên giran li girtîyan dibû bi her

tewrên biryar domandinê îşkencên nemirovî bi hemû pergaleên hovberî pêkdihatî.

Di pêkanînen mahkemê û girtîxanê de ku sermeket, veqetandina girtîyan nebû çare vî demê hêza qolonyalist tunekirinê li ser pêkanînen nemirovî kîre karê jiyana xwe.

Li gor amancê burjuvaziyê Tirk, rewşa mahkeman bervajî guhurî û bûn hember qolonyalîstan çekê tekoşinê. Bi rastî ev çek bervajî guhurî. Ew çekên dij şoreşgeran, ew çekê hember gel bervajî dij qolonyalîstan karhat bi vî tégihîştinê, hêzên qolonyalist hêdana biryarên darxistinê nekîr, tevgerên tunekirinê pêkanî û vî domand.

Nexasim vî êrişê li ser rêberan pêkanî di 21 ê Adar'ê 1982an de endamê KM ya PKK Mazlum DOĞAN, 22 ê Adar'ê de tekoşerê rêber Ferhat KURTAY û Eşref ANYAK bi şewitandin û fetîsandinê qetilkîr.

Li mahkeman, û sazûman, bi hêza polis û çeşî û di helên bi hêz de ji jî hebûn û tevgera şoreşgeran û bilindahiya dozê hêzên qolonyalist bi tîrs û şikan rojên dide êrişên nemirovî û hovîtiya domand. Ji ber tégihîştîyê vî yekê ye ku bi pirane wan qetîl bike ew ê tesîrên giran li ser gel ber bi erîni va pêk were, kuştina rêberan da pêş û vî yekê pêk anî.

Ancax hember pêkanînen mahkema û girtîxanan şervanên PKK, endamên KM ya PKK M. Hayrî DURMUŞ, Kemal PÎR û girtîyên berxwedana rojîya mirinê 55 roj domandin amancên xwe û amanca qolonyalistê Tirk bi cihanê daxuyan kirin. 14 ê Tirmeh'ê rojîya mirinê destpê bû û 8 ê Êlûn'ê 1982an bi şehîdîketina M. Hayrî DURMUŞ, Kemal PÎR û Akîf YILMAZ giha dawîkê. Bi rewşa bermirinê girtîyên şer berxwedanê domandîndine û ala berxwedanê di vî rewşa xedar de ji destnexistine. Bi rastî jî, her rêberên wan qetîlbûbin jî, girtîyên tekoşina netewî ala berxwedanê ala tekoşinê û kel'a berxwedana parastin.

### DÎ VAN MAHKEMAN DE QEYD Û BENDÊN ŞER JÎ BİKAR NAYÊN

Hêza qolonyalist, van herdû salên dombuyîna dozan de qeyd û bendên xwe bikar neanî. Di dozên PKK de, hêza qolonyalist, ji ber tîrsa dozê her

dozên girtûxana bikarê dad'i xemilan-dibe ji hew hedan pê hat biryarê tune-kinê ro-biroj pêk ani.

Zelal e ku pêvajoya pirsina 5000 girtiyên PKK wê bigaha salan. Lê, rastîyek di ev e ku mahkeme bê qeyd û bend didomiyên. Yanî: mafên gotin û parastinê hertunbû, tenê dilxwazvaniya tevgera hemberê dewletê dibû sebebê biryar sitendinê. Loma, dawayên PKK ew dawene ku dibin kirasê dad'i de qirkirina esirên şer pêk dibû û bûbûn cihgera daxûyana qetliama û hemû mafên mirovî, û qeyd û bendên şer ku li hemû cihanê bikar tên di van dawan de hatine ecîqandinê.

Herdu hêlên nav şerek êşkere de qeyd û bendên navnetewa li ser tevgerên wan bikar tên û hêl bi van qeyd û bendan ve girêdahi ne ji bo hêza qolonyalist ev ji neyên gotinê ne. Lewra; ji ber hemû taybeten rejîma burjuvayê Tirk li ser êriş, hovî û qetliaman aveye ne pêwîste pêkanîna van qeyd û bendan navnetewa ji bo dewleta Tirk bîne gotinê. Kuştina endamên KM ya PKK, şoreşgerên navdar Mazlum DOĞAN, Kemal PİR, M. Hayri DURMUŞ, û gellek şervanên PKK nişanê ve yekê ne.

### BÎRYARÊN DARVEXÎSTÎNÊ DAXÛYANBÛNA BÎNKETÎNÊ NE

Hêzên qolonyalist bi qetilkirina rêberan domandina mahkeman leztir xist û di ber pêvajoya derbasbûna "sazûmana sivil"î de dawayan gihandê dawikê. Lewra bi vi awayî "sazûmana sivil" ji biryarên kuştina xelasdike. Ji ber vê hê berî gihîştina ve rewşê ji bo pêkanîna bidarvexistina xwe bikar dîke. Û êşkereye ji alik ve ji bo derbasbûyîna "demokrasiyê" *lemba şin* pêdixî ji alî din ve li dû-hev biryarên dervexistinê pêktin. Dawikanîna dawaya PKK ya Birecik ku derheq girtiyên de 7 bidarvexistin û mûbetek di 3 ê Gulan'ê 1983 êşkere bû û di 25 ê Gulan'ê 1983an di dawa PKK ya Diyarbekir de sitendina biryarê bidarvexistina 35 û biryarên mûbeta 19 şoreşgeran dibin nişana amanca qolonyalista Tirk.

Lê, ev netîca ji destpêkî ve qolonyalista Tirk xwe jê disitrînd daxûyanê meydanê bû û bi van biryaran hêza qolonyalist ve li xwe danî. Ku ji dest-

pêkî ve tevgera tekoşîna rizgarîyê mina refek isat bide daxûyankirin, bi van mahkema û biryaran pûçîtiya ve êşkere derketiye holê. Bi qetilkirina yeko-yeko rawestandina tekoşin rizgarîya Kurdistan pêknehat û tekoşin roj-biroj pêştir bû. Ji ber vê rewşê biryarên darvexistinê daxûyanbûna binketina qolonyalistê Tirk didin zandîninê. Û daxûyanbûna binketina siyasî bixwe ne.

### BÎRYARÊN DARVEXÎSTÎNAN BÎ QÎRKIRÎNÊN GÎRSEYÎ DÎXWAZÎN PÊKBÎNÎN

Dema 25 Gulan'ê 1983 biryarên dawa Diyarbekir ya PKK bi biryarê darvexistina 35a daxûyan bû, eşa qolonyalista Tirk di sinorê Tirkiye-Îraqê de kete nava Kurdistan'a Başûr û qetliaman pêk ani. Ev herdu pêkhatin béguman ne tevgerên îihvehatibin.

Bi pêkanîna ve tevgerê hêza qolonyalist, ji alikî ve pêkanîna darvexistina da pêşxwe ji aliyê di ve amanca pêkanînen qetliamên girseyê êşkere kirîye û ji gellek sebebên di bi pêkanîna ve tevgerê çavtirsandina gel xwest pêk bîne. Hêza qolonyalist bi vi awayî qirkirînen dema berê birtûne û li hember her pêşveçûna daxûyanên êşkere dîke ku ew ê bersivên wî qirkirînbîn. Ji bo ve yekê di pêkanîna tevgeran de hêlên sinor bijartî ye û ve pêk ani ye.

Li hember bidarvexistina rêberan hêzên qolonyalist tēgihîştîye ku gel bēdeng namîne û ro bi roj tekoşîna rizgarîyê xwe digre û pêşde diçe, hember van yekan bi tevgera êrişbazîyê êşkere dide nişandan ku biryarên bidarvexistinan ew ê bi qirkirînen girseyî pêk bînin. Rastî ji pêkanîna darvexistina şervanên PKK ji tesirên erîni, ji geşkirina hemberîya dijmin pêştir tu tîşt pêknayîn. Ji ber ve yekê ger amanc tunekirina tekoşinê be; êrişa kaniya tekoşinê ji dijmin re çarenî e. Bo ve ji zerp û êrişa dijmin li ser gel dikemile. Lê, îro gel'eki di nav şer de kemiliye heye û tunekirina vi geli û PKK nemumkine. Bi tēgihîştina ve rastîyê bi êrişa xwe ya zefîkari hêza qolonyalist şerê hember gelê me û PKK vegirti ye bi navê "derketina Îraqê" xwinrijandinê pêştir dixê. Demên berê ve bi navê operasyonan

pêk diani. Lê; di tevgera xwe da rastîyê bi alema cihanê daxûyan bû ku ev êriş bi hemû destikên şer; tanq, top hwd. pêk tē. Vê ji cihanê re daxûyan kirîye. Li ber çavên hemû cihanê bi hemû destikên xwe gundên dor sinor zefîgirtîye. Ev pêkhatin û tetbiqata "hêza çeleq" amanca emepryalizmê li ser Kurdistan'ê zelaltir dîke.

### BÎ BÎRYARÊN BÎDARVEXÎSTÎNAN Û BÎ QETLÎAMA ŞERÊ SERXWEBÛNA GELÊ KURDÎSTAN RANAWESTE

Di pêvajoya hem-demi de hember qirkirin û zerpên qolonyalist û emperyalistan tu tekoşinên gelan tune nebûne. Gelên di nav şerê serxwebûnê de hember êrişên dijwar disa tekoşîna rizgarîyê pêşdixî û ber bi serfirazîyê diçin. Hê di pêsketina destpêkî de be ji di rêberîya PKK de ew ê tekoşîna gelê me pêşveçûna xwe bidomîne.

Binneketina tekoşîna me di zindanan de bi hemû pergalan kişbuve. Di rewşa xedar û dijwar de domandina dozê bir û bawerî be û bilindkirina tekoşîna berxwedanê dana jiyane be wê gavê gelê di vi ali de kemilandi binnakeve. Ger dijmin hewqas har û êrişbaz be di ve rewşê de binketina xwe dibîne û ji ber ve her bi rojên bihuri hêza qolonyalist hovtir û dijwarir di-be.

Lê, ger di zindanan, ger di pêkanînen ser gel de hêza qolonyalist ew ê di gola xwini de bēyi fetisandinê. Lewra zilm û zerpa wan ne ku tekoşinê rawestîne; dijmin di derdorên ve rewşê de tē ber fetisandinê, hêrs û dijberîya gel hember qolonyalistan geştir dibe. Gelê Kurdistan ew ê xwedi li lawên xweyê dilsoz, şervanên te bidarvexistin û kuştinê ew ê derbîkeve û her-bîhn tekoşinê bilnd bike.

### HEMBER QÎRKIRÎN Û BÎDARVEXÎSTÎNAN GELÊN CÎHANÊ PÎŞGIRTÊN ME NE

Hember amanca tunekirina gel u pêkanînen nemirovî û di rêça domandin û bilindkirina tekoşîna berxwedanê da gelên cihanê hevkar û pişt-

(Dûmahuk di rûpelê 16a de ya)

# ŞERRÊ DÎ NAVBERA HÊZÊN DÎJ-REJÎMA ÎRAQ DÎVÊ BÊYÎ RAWESTANDÎN

Di dema irohi de, ji ber vê rewşa erîni, hoyên hundir û derva fêde bistûnin û ber bi serfiraziyê biçin, di dema xebatên piştgirtî û cebhê tene kirin, ew hêzên hember rejîmê demên dawî de li hember hev û dû şerr vekirin e. Ji xeynî ku dibe sedemê xwinrijandina şervanan di rewşa hûrbijariya Rojhelata-Navin de ji ber pêjrandinan tîne holê, hêlên şoreşger û pêşverûyên Rojhelata-Navin van pirsan dikin:

Ma hêzên Kurdistan'a Başûr xelîya xwe ya diroki di sa pêkûnîn? Ma gelo di ber bidestxistina sazûmanê, hêzên Kurdistan'a Başûr dikevin rewşa hêzên Îran'ê? Li ser sazûmana Îraq'ê kine şer dikin? Bersiva gerineka têdanê çi ye?

Tê zanin ku pişt şerrê duyemîn iro Rojhelata-Navin dema xwe ya giran û gertmîr diji. Mirov dikare bine zman ku iroj Rojhelata-Navin di aliyên aborî, siyasî, eskerî, tîkîlî û hwd. de bê daxûyanbûna şer, şerekî giran lê tê domandinê. Ku Rojhelata-Navin xwediyê pirsgirêkên giran yên civak û netewa ye, ji vê rewşa Rojhelata-Navin, ev hoyên germ ji xeynî hin deman ji dirokê ta rojên me dom bû ye. Yanî ne Rojhelata-Navin û ne gelên cihanê ji berberî û tekoşinên vê hêlê biyan nesekîni ye. Lê, her ku berberî û tekoşinên hemberiyê bi germî dombûbin ji, pergalek berberî û tekoşinên hemberiyê bi balkêşî tîrehbûne.

Li ser pêşveçûnên rewşa iro hin girêdankê ne demî hebin ji, rewşa iro pişt şerrê duyemîn ê cihanê virde bi pêşveçûnên aborî û siyasî hatiye

kifşkirinê. Ji ber vê navça berberî û tekoşinên hemberiyên Rojhelata-Navin ku bi şerrê cihanê yê duyemîn bêrayanina gelan, serdestiya li hêlê avabûye û emperyalizma USA bûye serkarê wê, bi amancê domandina serdestiya xwe statûkoya hêlê pêkânîne, li hember vê rewşê rawestandina hêlên sosyalîzm û demokrasiyê amanc dikin ku vê rewşê bipelîşin û rewşek nûh li Rojhelata-Navin ava bikin. Tekoşina van herdû hêlan rewşa Rojhelata-Navin dikifşîne.

Tengasiya emperyalizmê û ji ber pêşveçûna tekoşinên gelan berberiyên navbera hêlan iro bi hemû awayî xwe bi stratejîkî, taktîk û rêxistinî derdixê meydanê û pêşveçûn bi vê nûhbûnê pêkdibe. Di rojhelata iroj de hêzên şoreş û dij-şoreşê ji bo guhartina rewşa Rojhelata-Navin ger li gor pêşveçûyînên objektîvî xwe di alî stratejîk, û rêxistinî de bikar binin û pêkânînen nûh derbixin ew ê guhartina rewşa Rojhelata-Navin bi van yekan be. Lewra rewş bi van yekan ve girêdahi ye. Ku herçiqas hêzeka ber bi pêşveçûnê ve biçê ji emperyalizm salên 1980 li Rojhelata-Navin kozên nûh bidestxwe aniye lê, çiqas hêza gelan û sosyalîzmê hêzeka pêşveçûyî be ji sedemên destderketiyên kozên vê hêlê li ser tîgihîştin û tînegihîştina vê pirsgirêkê pêkhatine.

Ev rewşa em li serê disekînin bi hemû xedarên xwe iro giringiya xwe dide nişandanê. Ev rewş ji bo hemû hêlên Rojhelata-Navin di serî de ji bo hêlên navça şerrê germ, Filistin, Lubnan, Îran, Îraq û mîna bi rewşa Kurdistan'ê xûyane pêwîstiya xwe bi gi-

rani li van derdorên nişan dide.

Bû derbek ji bo paşveketina emperyalizmê tevgera gelên Îran ku ketiye gerinekeka giran, hêzên Îraq û Kurdistan'a Başûr ku li ber serfiraziyê, kêr radiwestin, derbxwarina tevgera Filistin û ku di vê rewşê de dibiya berpîrsiyariya xwe ya diroki bileystiyana tekoşina şoreşa Kurdistan ji ber jarbûnê xwedî li vê berpîrsiyariyê demayê û pirsgirêkên li ber wê, hwd. hemû ji ew rewşa ku me li jor taybetên wê daxûyankir jê di ajînin. Ku di vê rewşê de êşa van yekan tî kişandinê. Ger hêlên Rojhelata-Navin li ser van bingehan ji vê rewşê dernekevin, rêya vê yekê heye ku bê erîş û destavêna emperyalizmê, bi berberî û şerrên hemberiyê hêz û kozên hêlê ji pejrandinan nefîlitin. Heke hêzên şoreşger û demokrat ji vê rewşê xwe derbikin û li ser taybetên rewşê xwe bikemilînin, ew ê bi serfiraziyên şoreşan di nav cihê şoreşên dinê de re bigrin.

Di rewşa Rojhelata-Navin ku hewqas xedar e de navçeyeka germ Îraq'ê ye. Ew pirsgirêkên me li jorê gotiye hemû li rewşa Îraq'ê kombûne. Ji pêşveçûna rewşa Îran'ê, û nexasîm ji ber pêşveçûnên navça Kurdistan'ê pêwîstiya vê derê girantir dibê.

Bellê, bi rasti tekoşina şoreş û demokrasiya Îraq'ê rewşa şerê hêlikî nişan dide. Û di nav xwe da gellek pirsgirêkên dijwar, lihev zefî girêdayî xwedî dike. Ku li ser vê hêlê ne dem û hemdemî ji alî eskerî û politîkî xwe lê

girtine, bişkaftina pirsgrêkan li ser politîka û tekoşîneka şoreşgerî ew ê hatina şoreşên hêlên bela bike û ev yek gellek pêwîst e. Ji bo hêlên şoreş û dij şoreşê guhrandina mêzina hêlê di pêvajoyekî de derbas dibe. Bi hemû rewş û taybetên xwe tevgeran ve navçayê germ, tekoşîna sosyalîzm û demokrasîya Îraqê gellek girîng e.

Lê, berpirsiyarên ku ew ê dirokê pêşde bixin, hêzên sosyalîst û pêşverû ji kêmasiyên xwe pirsgrêkên rewşa xedar didîne nîşandane. Ew kozên hemberê rejîma Îran destketinê, ku van ji bidestnexistîna ku çewa hêzên hember Îran di rewşek pêjrandidane, mîna li ber ve pêvajoyê mabîna.

Tevgera hêzên hember Îraqê yê nezelalî ya proxram, taktîk, stratejîk û rêxistinî ji ve rewşê bikar û bar be ji, ji ber tekoşîna Kurdistan navçek pêwîst e di Rojhelata-Navîn de hêzên Kurdistan'a Başûr hewqas pêştir xwediyê neerîniya ne û bi ve xwedî barin. Ji ber ve pirsgrêkê di ve nivîsa xwe da em ê bi giranî li ser van hêzan bisin û hin pêşniyaran daxuyan bikin.

Îrojî hêzên Kurdistan'a Başûr bê li gor pêşveçûnên civak, aborî û siyasî gav bavêjin pêşde, di ve pêvajoyê de ji proxrama xwe ya berê a otonomiyê dixwazin pêk binin û disa ji keys û berberiyên herdu dewleta fêdê distînin. Û li ser vi bîngehî tekoşîna dimeşînin. Yanî ne li ser bîngehên tekoşîna politîkî û îdiolojîkî ya rast û bi pergala erîni ji keysan fêde nastînin: mîna xeletiyên xwe yê berê pêk tinin û bi vi awayî dixwazin bigihîjin dawîkê.

Li ser bîngehên berberiyê hêlên derva pêkanîna tekoşîna bi giranî taybeteka hêzên Îraqê gişteki ye. Nexasim ev yek ji bo hêzên Kurdistan'a

Başûr, taybeteka xuyane ye. Ger pêşîya ve yekê nêgirtin ev yek dawîkên pêjrandin û bînketa van hemû tevgeran der bike meydane. Lewra: xebatên di mehên dawî de ku li ser hev û dû pêk dihatin, ji bo piştgirtin û hevkarîyê û ji alî din ve meşandina berberî û şerrê dijwar nîşanin ji ve yekê re. Û ev rewş xedartir dibe.

Hêzên Kurdistan'a Başûr ji ber proxrameka şoreşger û demokrasî ji bo Îraq û Kurdistanê pêk binin. proxrameka welathîz û şoreşgerî ji Kurdistanê re pêşve bibin, li ser amancên xwe yê siyasî ê kevn û xelet tevger datînin. Ji ber pêkanîna van proxrama pirsgrêka cebhê di nav tengasiyan de û pêjrandî dimîne. Hê mafparêziya arizî, mafê hêlî û eşîrtî nava van hêzan dîkeritîne. Û hê di navbera wan de bêhejmar berberî û şer derdikeve. Ji xeyn van yeka, dixwazin hêlên Kurdistan'a Bakûr û Rojhelat bikişînin nav van berberîyan, ji berberiyên xwe ra bikin destik. Û ve ne li ser pêkanînen rast dimeşînin. Ev rewşa ku berdevkên xwe li van hêlên di bîafîrinin, ji bo ve yekê tîkîlî û pêkanînen di meşînin dibe neerîniya taybetên van hêza. Û neerîniyeka xuyan e ev e. Ancax dîbi ku ev tevger dest ji van xeletî û neerîniyên xwe berbidin. Bi hêlên din û gîrsên gelê Kurd ku li dervayê welatîna tîkîliyên xwe yê rast di karînen xwe da bidîne nîşandane. Dî vi alî de neerîniyên berê pêkneyên.

Îro Kurdistan'a Başûr di nav pêşveçûnên siyasî û civakî da ye. Avahiya feodala diguhure. Li ser vi bîngehî ev hêz ber bi şoreşgerî mûmkîne ku gav bavêjin. Di rewşên erîni de tewrên komunistî wê bîafîrin. Û li ser tevgersaziyeka nûh nerîna cebhê pêk binin û pêşvehatîna welatperwerî xwe derxin rewşek nerîni. Xeyn ve ji tevgerên din, ew amanca xwe ya otonomî biguhurînin amancek şoreşgerî

û mûmkîne ku li ser vi bîngehî tevgersazi û pêkanînan nîşan bidin.

Nexasim ji ber şerê Îran û Îraqê şert hê zêdetir gihane. Ku ger hêzên Kurdistan'a Başûr xebat û hatîna xwe ya berê bîhûr bîjari bidîne berçav û bi rexnegirî lê mêzekin û li ser ve bi hêl û hêzên şoreşgerê Îraq re proxramên zelal û rast derbixin û cebhe pêkbinin. Ne ew ê tenê ji bo Kurdistan'a Başûr, ew ê ji hemû hêlên Kurdistanê re karekî giran pêk binin.

Bi pêkanîna van pêşveanînen erîni ew ê bi hêlên din re tîkîliyên hêzên Kurdistan'a Başûr rast pêk werin, û di alî navnetewî de tengahiya heye ew ê vebibe. Ger di alî pêşveçûn û pêkanînen erîni de gav bêne avêtin ew ê ew dijîminahiyan berê bîqedin. Nexasim dijberîya navbera PDK û YNK û hêlên din wê bêyî hildanê. Ji xwe ew dijîminahiya li ser bîngehê berê avabûye ji guhartînan û ji ber rewşa siyasî re li van hatîye girtinê. Hêlên di ve berberiyê de xwedî sefîn, tîgîhiştîyê ve yekê bin ku ev tewrê wan zerar digihîne hemû hêzan. Ji ber ve dîbi ku dest ji vi tewrê xwe berbidin. Welew bê dijberîya hev û dû ev hêl bi hêzên hemberên rejîma Îraqê re li ser amanc û pêkanînen taybetê hêlê tevgerîdanek dîkarîna pêkbinin. Ji bo ve yekê dîbi ku şerrê navbera van hêlan bê rawestandîne. Ger bi ve tîgîhiştîne tevger deynin, ku xwediyê serpêhatînen dewlemendin ew ê ev hêz netenê neerîniyan hildin, ew ê roleka pêwîst ji bo Tekoşîna Rizgariya Kurdistan bîleyizin. Li ser tewrmeşandîna bi vi awayî em hêzên Kurdistan'a Bakûr, ji wan re li ser bîngehên rast tîkîliyan avakin, û di pêvajoyê de vi bigihînin hevkarî û yekîtiyên bi hêz. Çewan demê berê em ê disa ji di vi alî de xebat bidomînin. Û em ê bikar û barên xwe pêkanînan derdibixin meydane.

**\* Bimrî emperyalîzm, qolonyalîzm û paşverûyên hêlê!**

**\* Bîjî yekîtiya welathîz û şoreşgerê gelê me!**

**\* Bîjî piştgirtîya gelên hêlê, yekîti û hevkarîya tekoşîna şoreşgerî!**

## CUNTA FAŞISTA QOLONYALÎST ÊRÎŞÊ KURDÎSTAN'A BAŞÛR KÎR

### Ew ê Tevgera Rizgariya Netewa Kurdistan û PKK Bi Berxwedaneka Bilind Bersîva Êrîşên Nemirovî Bidin

Roja 25 ê Gulanê 1983 cihanê pêkanîna rûşîya çîna serdestê Tirkê li ber çavên xwe dit. Gelên cihanê ve tevgera libevkariya rejîma Seddam û qolonyalîsta Tirk, peymanê li ser "Esaû" pêkhatîye, li ser êrîşa Kurdistan'a Başûr heyirî, bi girî û hemberî li dijî ve rawest.

Mîna weşînê cihanê didin kifşkirîne, despêki de qolonyalîstê Tirk amanca xwe bikiras dikin, dixwazin veşêrin, lê ji sedemên berxwedana hêzên Tekoşina Rizgariya Kurdistan û dijberiya navneteweyî ve carê dest bi derew û daxuyanê xelotî kir.

Li gor agahdariya me û bi weşînê cihanê ku daxuyanê cunta faşista qolonyalîstê roja 25 ê Gulanê 1983a li ser tevgergirêdan û pêkanîna hêla Hekkarî êrîşê Kurdistan'a Başûr kir. Ku ji mehan kardomandîna tevgerê pêkdiha helên weşînê ve rewşê dineximandin. Piştî ku tevger pêkhat daxuyan dibe ku bi 45.000 hêza eskerî êrîş bikar anîne û ev hêza eskerî bi helikopter û teyaren balafirgeha Batmanê hatine parastin û piştgirîya wan çebûye.

Êrîşê di nav hemberîyeka giran de pêkhatîye, girsên hêlê, di serî de PKK û hêzên welathîz û şoreşger hember êrîşê berxwedanek bi hêz avakirîne. Disa weşînê biyana ku nexweşxanên bejayî, refên alikariyê li van dera girêdane eşkere kirin ku nexweşxanên bejayî yê "kizîlay"ê bi lez û bez li van deran hatine avakirîne.

Qolonyalîsta Tirk emsaliya pêkanîna Îsrail ku tevgera tunekirîna li Lubnanê girêda xwest wê li Kurdistan'a Başûr pêk bîne. Sazûmana qolonyalîstê bi hêza xwe ya firok û bejîyê, bi bombe û berika hember hêzên Kurdistan û rêberên tekoşînê qirkirîna xwest ku pêk bîne. Ev tevger nexasîm hêla Hekkarî û li Kurdistan'a Başûr ji alî çekdarên hêzê gel ve berxwedanan hemberî dit. Pîraniya girsên hêlê ber bi hêzên pêşverûyên Kurdistan'a Başûr û helên di ve koçber bûn. Ji qetliamên girseyî filitîn.

Bi agahdariya êrîşê ji mehan ve hêzên pêşverû û şoreşgerî karbûnê pêkdianin hêzên Kurdistanê bê derbên xedar ji nav ve êrîşa dijwar der-

ketin û bi pêkanîna berxwedanan derbên pêwîst li hêza êrîşbaz xistin.

Bellê ku di bihdemekê de rewşa serî li Kurdistan'a Başûr pêk hat, cihan bi pergaleên heyrîmayîne di pîrse: çî dibe li Kurdistanê? Di rewşê hewqas xedariya cihanê de, bi vi pergale çewa tevgerêkdibe? Sazûmana Iraqê ji bo çî û bi çî awayî ray lê tine? Navê tevgera Kurdistanê ku nayê zman çîma hewqas xedar tê ditîne? Tevger çî netîcan pêk bîne? hwd. pîrsan dipîrsin. Dinya û gelên Rojhelata-Navîn xwe li pêş pêkhatîneka, bi hemû awayî tesîr li ser hatîna wan tesîr dike xwe ditin.

Ev yek buyîneka çarenîna bû. Lewra: mîna karbidestên qolonyalîstan daxuyan dikin amanca pêkanîna êrîşê "parastîna tixûb û tevgera teng" nîn bû. Ji bo emperyalîzmê li ser vi bîngehî ji bo pêkanîna êrîş û zefîkariyê bicîh bîne, di despêkê de tunekirîna Kurdistanê û taybetên Kurdîtî ji holê rabike, hêza rizgariya netewî bin bixe, û rejîma dîktatoriya Seddam bisitirîne, ji bo emperyalîzmê rewşeka erîni li holê avabike, amancê van yekan êrîşê dabû pêşxwe.

Sebebên pêkhatîna êrîşê, ji nêz ve dîbi ku li pêşveçûnên Kurdistanê bê girtîne. Îro em li ber çavan dibînin ku ne tenê girêkên berberîyê Tirkîyê û Kurdistanê: yên Rojhelata-Navîn li ser navçaya Kurdistanê bersiv dibînin.

Ji dirokê ve çîna serdesta Tirk û taybetên îro dibînin ku di herdemên tengasiyan de bi pêkanîna talan û êrîşa gelan xwestîye tengasiyên xwe bibuhurîne. Îro bi hebûna burjuvaziyê Tirk ev taybet derholê buye û dixwaze tengasiya xwe li ser van pêkanînan bibuhurîne. Ku kapitalîzma Tirk bi hemû taybetên xwe di nav pûçî û pejrandinê de dimîne. Di pêvajoyê de bi derbek faşîst xwest ku hebûna xwe bisitirîne, ji bo jiyandomandîna xwe lûla jiyana abora xwe vedike derva, di vi alî de malşînkîya wî û emperyalîzmê pêk tê. Ji sedemên van yekan xwe bi pergale emperyalîst û qolonyalîstê dixemilîne.

Di vi alî de Tevgera Rizgariya Netewa Kurdistanê ji bo emperyalîzmê û

nexasîm ji bo karbidestên Tirk tevgera xedar tê ditin û dîbi ku bînxistîna wê pêk were. Lê burjuvaziyê Tirk baş dizane ku ev yek ne hêsane. Lewra pêkhatîna êrîşa Kurdistan'a Başûr ne ji îro ve pêkhatîye: ev pêkhatîna domandîna pêkanîna li ser tevgera Tekoşina Rizgariya Netewa Kurdistanê û PKK tê domandin: perçek ji ve amanca tunekirîna ye.

Ji afirandîna PKK ve hember hêza tekoşînê pêkanîna tunekirîna domandîye, di sala 1978an da qetliama Mareşê wê daxuyanî kirîye û ve amanca xwe her gav li ber çav rawestandiye. Pêkanîna orfî-î idarê, operasyon û tetbîqatên domand ji bo bi-gihîje serfirazîya xwe, ji paşverûkan ta helên sosyal-şoven û refên burjuvaziyê biçûk êrîşa ser PKK bi dijwarî pêkani ye.

Ev êrîşa tunekirîna bi hemû pergale û destîkan hatî domandin, bi 12 ê Êlûnê gihaye qeysa serî. Rastî ji tevgera tunekirîna Rizgariya Netewa Kurdistanê û rêberê tekoşînê PKK bi 12 ê Êlûnê bi pergale serî ji helên gundîta ta helên girtîxana bi hemû dijwarîyan hatîye domandinê, û ji bo serfirazîyê hemû destîk û pêkanînan daye pêşîya xwe.

Lê, di nav hemû pergale û rewşên dijwar de berxwedan û pêşveçûna PKK ranewestîya ye, pêşvetir çûye. Welew wundabûnên pêwîst dibe ji, hember hêza qolonyalîstê bi hêz rawestîye.

Di nav dijwarî û êrîşên dij-şoreşî de Konferansa Yekemîn kemilandîye; Kongra xwe ya Duduya pêkani ye û li ser bîngehê pêşxistîna tekoşînê adan ev karbûna xwe herikandî ye nava welat û li ser vi bîngehî xwe ber bi xemlandîna ve birî ye. Îro ev kemilandîna pêşveçûnên PKK gihane pêvajoya şerê gel û di vi alî de hêza şoreşê xwe daye nişandan.

Bi tegehîştîna ve rewşa xedar serkarên cunta bi hemû hêza xwe ji nû ve tevgera tunekirîna girêdane. Ji alîki ve derheq şervanên şoreşê de biryaren darvexistîna pêkanîna, ji hêla din ve hember hêzên berxwedanê eşkere

## HEVPEYVÎN BÎ ANÎTA GRADÎN RE

**BERXWEDAN-** *Derheq pîrsgirêkên koçberan yê aborî, civatî hwd. xebatên pêktên û pîrsgirêkên pêşberî wê dibin, di derdora berpirsiyariyên xwe da wun dikarin vejandîneka kurte-birî li ser van yekan daxuyan bikin?*

**Anîta GRADÎN-** Mina tê zanin, ji xeynî hatina biyanan nexasim koçberên politîk tene Swêd.

Ev ên tene Swêd çareninîne ku sebebên hatina xwe daxuyan bikin. Ji bo me ji hatinê ra sebeb dibî ku hebin. Ji rewşê agahdariyê pêktê ku piraniya biyanên hatine, koçberên politîk in. Di salên dawiyê de nêzi 7000 koçberên politîk û hewqasan malî (zwaç û anîna malîyan hwd.) ji sebebên kifşî hatine vêderê.

Ji ber vê rewşê, di destpêkî de zûtîrkirina serilêdanê politîkî datînin pêşîya xwe. Lê, min a tê zanin gellek caran bîyarsitendîna derheq serilêdanan hêsan pêk nayê. Ev, dibe sebebê dirêjbûna demê. Lê, bi hemû yekan em li ser vê disekinîna ku neûca di demê kurt de pêkbinin.



Anita GRADÎN

Ji bo pêvajoya duyemîn: (pişt ku ray li rewşa wan dibe) ji bo di nav civaka Swêdê koçber bi cih bibin an destê alîkariyê dirêjî wan dikin. Hinbûna zmanê Swêdî, taybetên jiyana berê (zanistîya wê, kîjan dibistane xwendîye, çî karî dîke, hwd.) bi karên zangêriya Swêd va girê bidin. Bi hinbûna zmanê Swêd zanistîya xwe di demê kurt de biqedîne, karê ji xwe ra bibîne, bibe xwedîyê kar. Hin koçberên politîk di nav zangêriyê da ne. Wê gavê pîrsgirêkek ev ê ku em destê alîkariyê dirêjî wan bikin ku zangêriya xwe bidomînin. Mina wun ji pê dizanin tengasiya aborî li Swêd tesir li karê jiyane dîke. Û çewa iro rewşa jiyane dijwar dîke ew ê bi salan vê dijwariyê li ser

jiyana kar bidomîne. Wiha xuyan dîke.

Berberîya kar, kêmasîya zman hwd. li gor demên berê karditîna ji bo biyanan dijwartir dîkin. Niha pîrsgirêka pêş me cihkirîna koçberan û bersivanîna pîrsgirêkên wan e. Em li ser van yekan xebat dîkin.

**BERXWEDAN-** *Ne li qeyse welatên Awrûpa be ji, dijberîya hember biyanan pêktê berçavbûna tengasiya aborî tengasiya jiyana civakî û derheq pîrsgirêka hotalîyê de ji bû bîskavînek kurtîka me heye?*

**Anîta GRADÎN-** Belê ger li dema berê salên 1982 be nêrinê eşkere xuyane ku ji debara herkesek Swêdî ji %2 û ketîna debarê xuyandibe. Ji bo pîrsgirêka aborî zana û hunermendê Abanê ta sala 1983ya ji bilindbûna debarê nadin berçavên xwe. Mina pêşî min go di demên tengasiya aborî de bi piraniyê kêf di alî debarê de rewşên dijwar dîji. Ev rewş, biyanên, koçberan, seqet, sêwî û xortê di hoyên dijwar de dirawestîne. Bersivanîna tengasiya aborî bo min pîrsgirêkeka pêwîst e. Ji xwe bersiva min ê tengasiyê di beyana hukumetê de kifşî bûye. Bi van programên hukumetê pêk ani ye, daxuyanî ku di diravên hêla kar, alîkariya abora karandinê tîne. Ji bo aborî di rêçek rast de be gerandinê ji xeynî wan yekên develasyon ji bi destki hatîye xebitandinê. Îro, min a tê ditin tesîra van yekan hemû xwe daye nîşandan. Lê gellek şaxên endustriyê hemû hêza xwe nikare bikar binin. Tene di %70 vî karî pêktînin. Helbet pêkanîna vê hêzê dibe sebebê bikariyek bilind. Wê gavê domandîna wan tedbirên politîk dertê pêş me. Ji bo biyan û koçberan fonên arizî pêk hatin. Nîzam wê proja Kîsta bihistûyê ji bo vê henkerêk be danê.

Ji bo ku biyan û xort di hêla kar de xwedî kar bibin û ji bo alîkariyê wan re beyî kirin îmkânên arizî ji sazûmanê karger û ji hêla karê pêk hatîye. Ev karandin li gellek ciyan heye di vî alî de bêguman gellek biyan di heyre ku neheqî li wan dibe dimînin. Nasbendîya dijî û dibînin ku, ez ji bawerînim ku navbendîyek wiha heye. Heta memurê karî, ji bo kar, dema serhildanê ku nav ne Andersson, ne Petersson û hwd. be sitendîne wî dijwartir dibe. Heta niha bendîya pêkhatî negihîştîye qeyseke bilind. Li gellek hêlan ev pêktên û tene jiyandin. Lê hember wan tedbirên bi tesîr hatine sitendîne.

**BERXWEDAN-** *Hin hêlên berpirsiyar û sazûmanên koçbera, min a ta berpirsiyariya wê agahdariyê bûye, ji bo hêlên hember zilm û zerpê koçberbûne, bi cûdatî û li ser esasên hêlî serilêdanên koçberan dimeşînin vê yekê bi çî awahî dibînin?*

**Anîta GRADÎN-** Hatina hêla ne ya vejandinê ye. Ger kes li welatê xwe di bin zerpa politîkî de be ew kes koçberê politîkê ye.

Hêlên biyanan û hukumet dema pîrsgirêkek divejîninî wê gavê hep hep li serê disekinîna. Ji ber çî sebebên hatîye vejerandinê ew ê çibe serê wî hwd. bi hûr-bijari li ser tê seknandinê. Hêl ji bo vejandinê nabe destîk û nabe bîngêh.

**BERXWEDAN-** *Mina tê zanin koçberên hêlê Kurdistanê her ku hebûna van dewleta nasnakî ji dîsa, ev welatîyê van dewleta tene ditin. Herçûqas tu tîkîliyên wan bi van dewletan re nemabe û tîne be ji di statuyên wan dewletan de tene beşkirin û karê wan bi vi awayî tî domandinê. Ji bo ser rewşa û ji bo ku ev hêl welatîyên van dewleta nene ditin û di statuya van dewletan de karê wan nê meşandin tu xebatê we hene?*

**Anita GRADÎN-** Yê ku tî vêderê xwediyê pasaporta Tîrke ger Kurd be ji ji ber vê: bi welatîyê Tîrkiyê, Îran, Iraqê derbasî qeydê dîkin. Qeyda wan li ser bîngêhê pasaportê pêk dibe.

Ji bo welatî û girêdaniya netewatî du taybet hene. Ji bo me ev derbas dibin. Ger misalek bidim: ger kes ji Iraqê hatibe, û li Iraqê jîyan domandibe ew bi welatîyê Iraqê tî ditin. Lê, ger kes di navbera Tîrkiyê û Iraqê de jîyan domandibe, yanî eskerîya xwe li Tîrkiyê kiribe û li Iraqê mabe an jî hêlek wek Lubnan be wana di nav statuya newelatî de tîne ditinê.

**BERXWEDAN-** *Derheq karanîna giraniya gîrsa koçberan de bi her hêlî agahdarî çêdibin ku dewlet û sazûman vê gîrsa pêwîst jî amancên polîtîka xwe ra dîkine destik, li ser hebûnê vê gîrsê polîtîka dimeşînin, derheq vê rewşê de ditîna we çîye?*

**Anita GRADÎN-** Mina tî zanin polîtîka biyana li ser mafên hîlbijartînê, wekhevî û amanca demokratî pêkhatîye. Dêrdora vê de li vê amanca yekemîn; ew insanên ku hatîne vêderê, ji bo li Swêd bijîn, hînbûna Swêdî ye. A duyemîn, sitendîna çand û serpêhatînê gîrsê ji bo me ne mumkîne. Sebebê sitendîna van yekan tîne. Nexasîm ji bo çand û taybetên xwe pêşde bîvin alîkarîya projê û xebatan bi gelek rêxistinên biyanan tî kirin. Ku hebûnê xwe pêşde bîbin. Domandîna Kurdî, hebândîna Swêdî, an sekna navbera herduya girêdahî kesa ye. Di vi alî de ditîna me ye ku; xwedî li taybetên xwe û hatînen xwe derbîkevin. Ev tiştêkî baş e. Û ji bo pêkanînan hînbûna zmanê Swêdî em bawerîn ku tiştêk çarenîne. Lewra: jîyan û pêkanî ew ê bê vê dijwar be.

**BERXWEDAN-** *Mina tê zanin; cunta faşîst ji bo cîhgera xebata soresger û welathîzan teng bike û derheq rêber û xebatkarên wan de şîka pêk bîne beyanên nerast daxûyan dîke. Û qeyd û bendên mafê navnetewatî ji bo amanca xwe ya rûreşî dîke destik. Welatên sefgirtî van benda dîke spara xwe ku derheq van kesan de pîrs vedîke. Vê rewşê bi çewayî dibînin?*

**Anita GRADÎN-** Kî wîlo dîke? Rêxnen we derheq Almanya Roava de pê dizanîm ku ew ê hebin. Bi wan re van yekan bîpeyvin. An jî ev karê rêxistinên wê derê ye. Berpîrsiyarên sazûmanên Almanya Roava pê nîzanîm çewa dixebitîn. Her dewletek sondxwar e. Dewleta Swêd derheq xebatên wan de dest naxe nav karên wan. Ev karêk berpîrsiyarîya wan e.

Em jî alî xwe va qîmet didîne lihevhatîna Cenewre, û li ser vê yekê pêkanînen xwe dimeşînin.

**BERXWEDAN-** *Endametiya Konseya Awrûpa, rojnamevanî, hwd. û piştgirtekê tekoşîna gelê Vietnam, Îspanya, Portekîz û hevalkariya gelê Yunan hember cuntaya te bi rewşa milletwekîlî pêkani û di van aliyan de xebatan kirîye. Tu kari xebatên xwe vê van aliyan bi*

*kurte-birî daxûyan biki.*

**Anita GRADÎN-** Derheq pîrsgirêkên Navnetewatî de 30 sal xebitîme. Ji ber vê yekê, di vê pêvajoyê de bi gellek bûyerên polîtîkî ra tîkîliyên min çêbûne. Ev dibe nişana partîya pêva girêdayî me ku çîqas piştgirîya navnetewatî pêwîst dibîne serketîya jîna; ji ber pîrsgirêkên jîyana jîna bû û hwd. Endametiya Konseya Awrûpa min gotibû. Bi pergale avakare komîtê piştgirîya gelê Yunan dema cuntayê da bû. Em vegeerîn pîrsa...

**BERXWEDAN-** *Mina tê zanin bê pergale mafê mirovî, qeyd û bendên navnetewatî, li ser girtîxanên Kurdistan û nexasîm li girtîxana leşkerîya Diyarbekir, qetliam, kuştî û îşkencên pêkhatîne bi gellek pergalan daxûyanê alema gîstîkî bûn û mina agahdarîya me ev pîrsgirêk ji alî milletwekîlan ve hate rojava parlamentoya we. Di van mehan de dewleta Tîrk bi tewrê siyasî, derheq gellek soresger û welathîzan de bîyarê bidarvexistîne sitend û îşkence û bûyerên kuştîne dijwartîr didomin. Li hember vê dijminahiya mafê dij mirovî dewleteka ku dewleta Tîrk giliyê Konseyê kirîye ku bê tewr û bê daxûyan maye, vê rewşê bi çî awayî dibîni? An tiştên pêkhatîne dikari daxûyanê me biki?*

**Anita GRADÎN-** Hê çend heftî berê bîyarê derheq darvexistîna 35 Kurdên Tîrkiyê hate sitendin.

Ew nişana wê ye ku jî bo Tîrkiyê guhbide mafên mirovî û van pêkbine hember hemû tewrên mahkema Konseya Awrûpa hefta çîqas Tîrkiyê bêje rewşa min guhurîye jî ev çêdibin. Ev yek pêktî. Xeyn vê, pêkanîna anayasê û dîrkîrîn û rawestandîna polîtîkaciyan berê yanî xebata sazîrîna partîyan bi min ew ê li gor xwestînan hebândîna generalan be.

Lê, Tîrkiyê hê hember mafên mirovî şûçên giran pêktîne. Nexasîm komîsyona Awrûpa hember bîyarê bidarvexistînan bîyar sitendiye. Ev didin nişandane ku Tîrkiyê mafên mirovî diceiqîne.

**BERXWEDAN-** *Li hember van qetliam, îşkence û kuştînen êskere û rewşa ne li gor mafên mirovî hêlên Awrûpa; kes, ref û nexasîm Amnestî vê rewşa nemirovî, û dijberîya mafên navnetewatî daxûyanê cihanê kirin. Ku Swêd di nav dewletên cuntaya Tîrkiyê giliyê Konseyê kirîye di vi alî de jî hêla wezîrê derva û hêlan ve xebatan daye pêxwe?*

**Anita GRADÎN-** Îro bi pêkhatînen Konseya Awrûpa nîzanîm. Di vi alîde jî wezîrê derva hun dikarin hînbîbin. Lê, dizanîm ku hukumeta Tîrkiyê di meha Çîle de dem xwestîye. Ji bo demêk pêş de bersîvan bide. Lê, hêjî ne bawer im ku bersîv dabe.

Di rewşêk wîha de jî bo Konseya Awrûpa, Komîsyona Wezîra û meclîsê tenê rê, jî ber ku Tîrkiyê qeyd û bendên Konseyê bi cîh neaniye ditîna rawestandîna endametiya Tîrkiyê derbîkeve pêş. Û vê yekê pêkbinîna.

**BERXWEDAN-** *Mina tê zaninê hêlên demokratî û soresgerên Kurdistan û Tîrkiyê hember bidarvexistînan û îşkencan xebatek derhola Awrûpê de dimeşînin. Bi serpêhatînen xwe derheq vê xebatê de ditîna te çîye?*



**Anita GRADÛN-** Bellê, iro ji bo pişt-girtiyên politîkî ku di girtixanan de ne bi gellek pergalan xebatên piştgirtinê têne domandin. Navberiya van xebatan û serpêhatinê berê ev e ku komîteka bi hêz pêknehatiye. Ev ji ne kêmaniya Swêdiya ye. Mina we Kurdan rêxistinên Tirkîjanî nayên berhev. Ev dibe sebebê parvebûnê. Du sal berê ji bo sazîkirina komîtekê xebatên giran çêbûn. Ji sedemên xuyane hemû rêxistin li hev komnebûn.

Em sefgirtiyê vê yekê ne: pişt-girtina hêzên pêşverû û demokratê ku tekoşinê ji bo sazîkirina Tirkîyeka demokrasî pêkûnin.

Ji alî din ve, em agahdarbûyîne xwe ji sendiqên serbixwe, (AIS; Navçaya Tevgera Karkerên Navnetewa) ji delegasyonên diçine Tirkîyê, û ji avûkattan distînin. Avukat Tomas Ragstel raporê xwe yê derheq mahkeman de daxuyankir. Xeyn van; hin delegasyonên resmî-neresmî ku diçine Tirkîyê hene. Bi vi awayî bi girtiyên politîk û malîya re alîkariya aborî pêkûnin û piştgirtiya hêlên Tirkîyê bikar tînin.

Em pêdizanin, li Tirkîyê cunta heye û disa em dizanin ku ew dixwazin sistema xwe bisitînin. Berê di Konseya Awrûpê de xebitûme. Min berpirsiyarê Tirkîyê guhdar kiriyê. Îdia kirin ku: "di alî mafê mirovî de tu xeletî nakin". Bi alîkariya sazûmanên navnetewa, Tirkîyê vê yekê li xwe dani. Bi vi awayî di Konseya Awrûpê de ji li serê hate seknandin. Konseya Awrûpê li ser van agahdariya radiweste. Ji xeynî Tirkîyê rêxistinên din di vi alî de gellek kêrhatine. Sendîqa, û rêxistinên navnetewa ji bo Başturk hwd. gellek gerên vejandinê pêkânin.

Derheqê Tirkîyê, girtixanan û buyeran agahdariya me heye. Mina tê zanin hukumeta Swêd, Norwêç, Danîmarka, Îzlanda, Hollanda û Fransa jiber mafên mirovî dieciqîne Tirkîyê giliyên Mahkema Awrûpê kirine. Bi gumana em ê bi serê xwe vê yekê bi bersiv bikin ne pêwîste tevger pêk were. Di vi alî de li holêye ku em li kîjan alî radiwestin û li ser buyeran, pêkhatinan disekin.



## Cunta Qolonyalist Êrişî Kurdistan'a Başûr kir...

(Destpêk di rûpelê 13a de ye)

êrişê pêkanin. Bi vi awayî xwestin ji tengasiya xwe ra bibinin.

Lê, amanca êriş û pêkhatina wê ji ber berxwedana PKK û hêzên welathîzên Kurdistanê negihaye serî, bi netîca afirîye ev çêk bervajî hember hêza qolonyalist rawestîye. Eşkere ye ji ber taybetên êrişê ew ê hemberî û berxwedana hêlên Rojhelata-Navin pêkwere û cunta bikeve tengasiyeka giran. Yekîtî û hevkarîya hêzên Kurdistanê ew ê bigihîje bîngehi hevkar û piştgirtêkên Tekoşina Serxwebûna Kurdistan fireh bikin.

Ji ber taybetên êskere hê ji destpêkî ve amanc û pêkanîna êrişê rawestî xedar ji hêza qolonyalist re avakirî ye.

Di hundur de pêşveçûna berberîya hêlên burjuva wê pêştir bibe, ku ji xwe pêştir rêya jiyane ji tu hêlî re nabîne ew ê cunta faşîst di nav van êriş û dijbeniya beşerî de ne ku rêya jiyane bibîne ew ê were ber bîhna dawîye.

Ku cunta qolonyalist li ser pişt-girtina emperyalîzmê ava ye û jiyana didomîne, li ser vi bîngehi hemberî û êrişbazîya gelên Rojhelata-Navin pêkûne, çikandîna kaniya jiyana wê heibet kar û barê hêzên welathîz û şoreşgera ye, girêdayê hevkarî û pişt-girtîya wan e. Nete ne ji bo binxistina sazûmana Tirk û Îraqê binxistin û hilweşandîna hebûna emperyalîzmê ji girêdayê tevgersaziya tevgera Rizgariya Netewa Kurdistan û yekîtîya berxwedanê ye. Ku wê hatina gelê me zelal bike divê alî de pêkanîna xebatê gellek pêwîst e. Xebata vi alî karê hemû kes û hêlên pêşverû, şoreşgerên Kurdistan e. Di vi alî de bîxebatî, rawestandîna bendavakari dijminahiya gel e. Avakirîna tevgera hevkarîyê ne tenê ji gelê Kurdistan re pêwîste, ji bo hêlên Rojhelata-Navin ev karê jiyane ye.

Di vê pêvajoya emperyalîzmê û sazûmanên berdevk ji bo tunekirin û temartîna tevgera gelan, êriş û pêkanîna dijwar dimeşînin, ji gelê Rojhelata-Navin gellek pêwîst e. Xebata vi alî karê hemû kes û hêlên pêşverû, şoreşgerên Kurdistan e. Di vi alî de bîxebatî, rawestandîna bendavakari dijminahiya gel e. Avakirîna tevgera hevkarîyê ne tenê ji gelê Kurdistan re pêwîste, ji bo hêlên Rojhelata-Navin

ev karê jiyane ye.

Di vê pêvajoya emperyalîzmê û sazûmanên berdevk ji bo tunekirin û temartîna tevgera gelan, êriş û pêkanîna dijwar dimeşînin, ji gelê Rojhelata-Navin û gelê Kurdistan re hevkarî û avakirîna piştgirtîya hêzî rêyeka çarenîne. Xebat û pêkanîna vê yekê berpirsiyarîya gel û hebandîna mafê gel e.

Bi vê tîgîhiştin û berpirsiyarîyê em tevgersazbîn, hember pêkanîna û êrişê dijmin, cebha berxwedana netewî mîna burcên pola em vebigrin.

Pêkanîna berpirsiyarîya hêzên Rizgariya Netewa Kurdistan, ji gellek taybetan bi hevkarî û piştgirtîna hêzên demokrasî û sosyalîzmê ve girêdahi ye. Bêguman ji bo bîşkavtîna pîrs-girêkên Rojhelata-Navin ku navçeka bîngehiya Kurdistan û berxwedanên Rojhelata-Navin pêkhatînen vê navçê berberîya sistema emperyalîzmê pûç û berberîya hêza sosyalîzmê û demokrasîyê ye. Di vê berberîyê de gelên cihan û hêza sosyalîzmê ji şîrîke berpirsiyarîya gelên Rojhelata-Navin û gelê Kurdistan in. Dîbi ku ev hêz tekoşîna berxwedanê bigrin û bi hêz bikin.

## DAWA PKK DAWA SERXWEBÛN Û ...

(Destpêk di rûpelê 8a de ye)

girtiyên gelê Kurdistan in. Çewa mîna gelê Vietnam di şerê serxwebûn û azadiyê de û çewa mîna gellek gel didomandîna şerê şoreşê de serpêhatînen gelan ji xwe ra dancizan dîbin ji bo gelê Kurdistan ji ev yek heye.

Li hember êriş û zorbazîyên berdevkê emperyalîzmê, di qolonyalîsta Tirk bilindkirîna tekoşin û dengê gelên cihanê dibe hêz ji ezm û domandin û serfirazkirîna tekoşîna me ra. Domandin û pêkanîna tevgerê hember dijmin, qolonyalîsta Tirk ew ê bibe bîngehê avakirîna biratîya gelên me.

Li hember sitendîna alîkariya emperyalîst û paşverûkan ku ji bo hêza qolonyalist tevger girêdidin, gelê me bawere ku alîkariya hêlên pêşverû ew ê ji nêz ve bibîne û piştgirtêkî û hevkarîna tekoşîna gelan ew ê bibîne.



## TÎYATRO -2-

(Destpêk di hejmara derbasbûyî de ye)

Girtiyek li milê çepê mina guhên xwe li diwar pan kiribe, li hawirdorê xwe çend caran çavên xwe dive-tine û xwe li quncê diwar di telîne. Bi herdû destan; hêdi hêdi kefa destên xwe li diwar digerine. Guhên xwe ge li vi ali ge li ali di dive-tine. Û li ber diwar qewzi ser hev dibe. Ku mêzedike sewt hêji didome, bi dengê nizm gazi dikê.

**Cahit-** Lo hevalo! eman hêdi, hêdika. Niha wê hov bèn êrişî me hemûyan bikin.

**Muhsin-** Başê, tamam-temam; erê ê ki yî? Çi kesî.

**Cahit-** Ezim. Berxwedar.

**Muhsin-**

Li çiyê xwe kêfxweş dibe, bineka fireh distine. Hov hedan pê dikeve.

– Lê tu..., tu ne ew Cahidê me yê Batman'ê yî. Min ji dengê te...

**Cahit-** Belê.

**Muhsin-** Yê rastê ki ye?

**Cahit-** Eli. Ew ji ji me ye. Wî nûh ji îşkencê anîn. Tu kiyî?

**Muhsin-** Guhê wi bi diwar ve çavên wî dikevin erdê. Binek dikşene; bi made ki sar û bi raman: keko... keko...

**Cahit-**

Bi bersivê ra sar dibe. Tûka qirêka xwe bi zorê dadiqurtine. Arçûmekên xwe li hev dijdine. Rûyên wî sar û sipî dibe, eniya xwe li nav kefa destê xwe digre, êş û raman ji rûyê wî tîn xwendinê. Neksa wî radibe dadikeve. Bi axinek dirêj bin dikşine.

–Çi, çi dibêji?!

**Muhsin-** Wisa çebû. Belê, lê rasûya navê min: yanî têtigihê...

**Cahit-** Belê, bellê gellek tiştan têtigihim. Bila neketayî zêftê!

Hah-ha deng ji eywanê tîn. Dengê linga tîn. haya te jê be. Hişş bê deng be. Zû-zû dengê xwe neki!

**Muhsin-** Herê, herê. Hiih, h-iih.

Qerdiyanek mina rovi, mina gurê keysbaz bi çav-sori ber bi Muhsin va tê. Qerdiyanê din ji ali çepê ve xaçe-dar bi cih dike, di sipêre diwar û diçe.

Qerdiyan pêl serê lingê xwe dike û tê ber deriyê Muhsin.

**Qerdiyan-** Ç'ye?! Çi dibe li vir? Ma pê nizanin ku îşaret û axaftin qedexe ye! Dewarên kurê dewaran! Oho, oho ka lê birêne. Camêr çi zû raketîye. Hişt rabe ser xwe! Rab! Min bapirên wî nizam çi kiro?

**Muhsin-**

Dike ku rabe; xwe di libitîne. Lê hew kêr tê û disa dikeve.

– Tênahihêm rabim..

Qerdiyan tîn yek ji hêllek va wî di kişkişîne, yê din ji aliki ve bi simên xwe lê dide. Pêl sing û ran û milên wî dike. Car-caran pihina li serê wî dixê.

**Qerdiyan-** Ûla ibne xwe bi wêdrê negre. Berde! Negir! Destê xwe berde ha wisa ha. Çewaye! Bila qewdik li te hûr-hûr bibe. Ka berdidî, an bernadî he..!

Wê gavê qerdiyanek û yuzbaşî ji eywanê ve ber bi wan va tîn.

**Yuzbaşî-** Rab, rabe piyan. Ûla ibne rabe! Ne niha em ê hev û du bibinin. Ka wî girêdin. Zû!!

**Qerdiyan-** Emrke qomitanêmin.

Bi çêr û lêdanan dest û lingên Muhsin li xaçe-dorê girê didin.

– Ha, ha tamam filitandina wî tune ye. îşê wî tamam.

**Yuzbaşî-** Ka ji nûh ve dest bi çiroka jiyana xwe bike..

**Muhsin-** Mi pêşî çi dogit ew e!

**Yuzbaşî-** Rastiyê bêj e! Mina keran lêdanê nexwe ma çewa be. Tê disa dawikê hemû tiştan bêji. Ne ji Eleziz'ê, ji Batman'ê ji, pêşî hina mina te serhişki kirin. Lê, dawiyê mina bilbil xwendin. Oho! Em kela sebr'ê ne. Ka em ê mêzekin, tu yê çend ro li ber xwe bide... Lêdana te çiçase.. Ka ev çine! Hê em ê te bibine serê çiyên û te li wê derê geberbikin. An ji li wê derê bikujin û bivên bavêjin nav mayînan tuxûba... Haya kesî pê nakeve! Ma bibihizin wê çibibe?! Tu tiştêk ji nabe; lewra hemû tişt di destê min de ye; ne wilo?

Bi gotinê va, çav li qerdiyan dişikine û qerdiyan ji nişkava çixara vexistî datine ser singa Muhsin û çend hilma li çixarê dixê û bizota agirê çixarê geş dike. Çend bin di nav de derbas dibe. Bizota çixarê li canê wî vedimre. Ji ber ku qerdiyan hêrsa xwe neşikandîye qotika çixarê li ser deqa birinê dive-tine.

–Ha wisa! Xuydana ser berde ha.. Oho çimêre lo! Deng ji dernaxe. Netenê nalin! Ev ne bese... Qêrin bike, hewar bike, xwe bavê dest û lingê me. Ûla puşt qirin bike! Deng naki ne.. Tê hê gellek caran dirana li ser hev bijdini; emê bikin ku taqeta jidandina dirana ji nemine.. Ka bise hê ev çiyê?! Bêje, zû!

Ji Hêlwan'ê ki nazdiki?

**Muhsin-** Tu kesekî.

**Yuzbaşî-** Ki, çi karî dike?

**Muhsin-** Ni-zanim.

**Yuzbaşî-** Di kijan tevgeran de, ki hebûn?

Muhsin- Ni-zanim.

Yuzbaşı- Te çi kir, ji dirav û çekan? Çeka ji ki di sitend?  
Li ku û te daye ki?

Muhsin- Çekamin tune.

Yuzbaşı- Mustafa Aydın, Cemil Bayik û Dûran li kûne?  
Cihê wan kû dere?

Muhsin- Naz nakim, pê nizamim.

Yuzbaşı- Talimatan ji ki distenda?

Muhsin- Ji tu kesi.

Yuzbaşı- APO'ci li kijan gundan û li ku diminin? Ciyê  
wa...

Muhsin- Nizamim.

Yuzbaşı- Gezgirê kurê beqçi naznaki? Kijan tevgera?

Muhsin- Na!

Yuzbaşı- Te ki, li ku, û bi ki ra kuştî ye?

Muhsin- Min kes nekuştî ye.

Yuzbaşı- Tê niha bibini... Haydê şêrê min, gurên minê  
sibatê.. ez we bibinim. Ha wisa ha.. Zikê wi bi  
piştê va bizeliqînin ha, ha. Li ser-hev... de, de.. ha-  
ha bikin ku sing lê bidewxe. Ha wisa! Çewa ye,  
bin, binê lê biçikînin, bila pûst bin nestîne. Lêde,  
lêde piştê seri bila bidarê ve mîna bizmar biçike.  
Ha wisa wi ji mîrani bixe. Ha, ha bike ku zikê  
piçûk biteqe. Çewa! hê ji hiş diçi ne... Zû wi  
vekin; bila mîna telisê kayê terabe! Ha..., ha...

Erdê şil bikin!? Xwê lîkin! Hûrikên camê bi  
reşînin erdê. Zû zû..!

Qerdiyan- Emrke qomitanê min.

Çend temeke av dirêjin erdê. Muhsin di nav  
erda şil da dirêj kirî dimine. Tinin xûya mîna  
telaşa li erdê direşînin. Û hûrikên camê li serê  
bela dîkin.

Muhsin hildikîşînin piya. Çend caran ji destên  
wan dişemite, bê hiş li erdê pij dibe. Disa wi bi  
zorê hildidî û hê bi rewşa bê hiş li ser erdê  
dikişîşînin. Paniyê wi li erdê dixin ku hê bi  
hişê xwe va nayê. Pêşi şûjinê di ranê wi de li  
çend ciya dibin-tinin. Ku hê bê hişê: çend te-  
nekê avê bi hijdî pê de dirêjin û disa wi dikîşî-  
nin.

Yuzbaşı- Ha, ha wisa bi hişê xwe were. Rab, rabe piya!  
Xwe li erdê navê, lingên xwe deyne erdê: rabe  
piya! Zû-zû lingên xwe li erdê xe bileyze haydê!  
Haydê gurên min wi li ser cemedê bireqşînin.  
Hişk bigrin, ha wisa ha, wi bi lotkînin.. Lingê wi li  
erdê bikişîşînin. Bila baş erdê bigre. Bine piyê wi  
paniya wi baş bigihe erdê.

Herdû qerdiyan hişk ketine bin çengê wi, car-  
bîcar wi bi cotkani li erdê didin. Car pêl lingê  
wi dîkin, li erdê dibin piyê xwe da dibin-tinin. Û  
caran li dû xwe dikîşînin.

Lingên Muhsin ji xwinê sip-sor bûne. Ranê wi  
reş û sor bûye. Ji gellek qelşên hûrikê camê  
xwin ji ranê wi di herike xwarê.

Ku wi berdidin bê hemd li erdê pij dibe. Qer-  
diyan bi simên xwe çend derban li newq û serê  
wi dide. Yuzbaşı tê bi postala xwe pêl lingê wi  
dike. Di bin simê xwe da ci ecikine. Bi kapika  
xwe, kefa destê wi li erdê demek dirêj di ecikine.  
Ku ji nav destê wi xwin tê, nav pêçiyên wi diqel-  
lîşin, ji neynokên wi xwin derdikevi. Çend der-  
ban pê ve gavek paşve diçe, û bi hêrs derbek li  
newqa wi dixê. Muhsin bi ali di ve diqelibê.  
Çend pihinan li ser-hev li laşê wi dide û:

- Bêje, zû! Haydê ya ji tê mîna kurrê beqçi  
seqet bimîni, binê emê te bikujîn..! Emê jop tîxin  
te. Emê te ji mîrani bixînin; Nemêr bihêlin..! Heh  
tûû.. Serekên we bi keç û jinan kêf dîkin, wun  
we.. we dixapînin. Wun dibine qurban berxê qur-  
banê ji xwe tu.. tu kerî ker! Boş betal lêdanê dixwi  
kero! Li Eleziz`ê hemû axivîn, Şahin tenê liber-  
xwe da; lê yên çavberdabûn ciyê wi, dibên ku  
Şahin axiviye! Haha bê canê, ger tu ne peyivî ji  
emê belakî bêjin peyiviye!! Ku tu nepeyivî ji ewê  
bêjin ku axiviyî û ewê mîna destmalekî te bavêjin  
ser poxanê!

Ji ber xwe ger tu rastiyê nebê ji, ne peyivî, bi  
saxî ji vêderê dernakevî.. Tu ji destê me nafilitî! Te  
te teh. Çi heyf, çi heyf, çi bejn. Te heyf, mîze çi  
xortekî ye. Heyfa vê bejnê ter û ciwan! Te te bele  
sebeb tê seqet bimîni. Ohoo, ji xwe rêxistin pelîşî,  
belabû, me zinar Cemil, Dûran û Baki ji girtî ye?  
Lawê min feyda neaxaftinê tune ye. Ji bele sebeb  
tê lêdan bixwi. Serhişk nînbe. Bi me dilxweş be,  
dilê xwe pak bike. Ger tu ali me biki emê ji ali  
te bikin.

Qerdiyan- Qasek-berî qasekê bipeyive, ku ji vi hali bifi-  
litî, haydê zû!

Yuzbaşı- Haydê va em li benda tene ha. Zanîbi ku em  
nekevîrê sebrê ne. zû bi fikre..!

Gava tu deng ji Muhsin nabihîzin yek wi ji erdê  
radike, yê di li piştê wi siwar dibe. Wi dibin-  
tînin. Bi borî û qerînan sewtên ecêb derdixînin.  
Car-bîcar yuzbaşı lingê xwe dide berê ku wi  
bixîne xwarê. Caran bi lingên xwe derbên dij-  
war li qorikê wi dixê: hira-hira wi ye.

Şoş, şoşş ûla pûst xweş biçê! Deh-deha, ço-  
ço, şooşş.

Qasekê wi datînin navbera xwe û xwe li dora wi  
rêz dîkin. Bi lêdanan mîna gokê wi di navberê  
xwe de dibin û tinin. Pûst ku wi tîr dibin tinin.  
Rakîné pê bi bokse dilîzin. Muhsin ku hew li  
ser çokan dimîne, mîna telisekî bêcan li erdê pij  
dibe.

Ji ber tariya derî ji nişka va albayekî îşkenceci  
xuya dibe û dibêje:

Albay- Dest ji Brahim berdin! Bila bifîkire!

Yuzbaşı ber bi albay va diçe. Li ber guhên hev  
bi dîzi hin tişt dipeyivin. Mîna herduyan ji ray  
lê aniye serê xwe dihejinin. Yuzbaşı li qer-  
diyana difekire û çav ji wan re dişkîne.

Yuzbaşı- Wi bavên hucre wi.

Qerdiyan- Emirke qomitanemîn.

Qerxdîyanek cendekê Muhsin bi erdê ve di kişîşine dibe, yê di radike xaçe-darê û diçe. Ku di navde bihekê hê derbas nabe qerxdîyanek tê hêdika xwe li ber deriyê Muhsin diteline û bi dizi bala xwe didê. Tu tiştêki bal bikişîne ku nabine hemû gefa dev tu dike û bi hêrs û gefan dibê:

- Ha ev e ha! Xelata parvekarê welat ev e! Ev xelata parvekirinê ye. Çewa ye! Komînistê parvekar, xayinê welat, xayin. Wun xayinên welatî ûla, ûla pûst xwe nelibitîne; bi tevîze dîciyê xwe de! Ûla pûst bila qet dengê te ne! Ji êş û arînea hedara te namine ne? Ka bise ma qey ev çine?

Muhsin- Av... av... qurtek av!

Qerdiyan- Hele lê mîzeke. Ohoo şikir nake ku nemirî ye. Hê çî dixwaze. Avnê, av ha... gû vexo.

Muhsin bere-bere tê hişê xwe. Lêv û serçav werimine. Reş û sor mane. Cendek û serçavê wi ji xwin û xwê deq-deqî bûye. Gava çavên xwe baş li ser xwe digerinê li lingê xwe yê bi xwin diponije. Dike ku tiliyên xwe bilibitîne, ji êş û arîncê rûyê xwe tîrş dike, ku nalina wi tê.

Qerdiyan- Hiş, hişt ibne. Ku werim ez ê gûyê xwe û vi tîbixim devê te. Ranekeve... rab! Razan û vezilandin qedexene, axaftin û wêrin qedexene. Xwestina tişt-mişt ji qedexe ye tamam! Çûna tuvaletê ji qedexe ye. Niha ku ez bêm te di xew da bi qefêlim, wê gavê ezê çî binim serê te. Ku te di xew da bigrim, diyamin bibe jnamîn tu disa li nermijandîne yî! Va ez diçim, lê tu zani...

Muhsin ku binek wisa dimîne ji êş û arîncê hedana wi nayê, ji ser zik xwe dizivîrine kêlekê,



Lê ji birinên canê xwe disa xwe hêdika dirêj dike. Hêdika xwe bi ser-heva dikişîne û demek dirêj di ponije. Hêdi-hêdi lîvên xwe dilibitîne:

Muhsin-Wun xwe dixapînin. Dibin îşkence û ezîyeten giran de ji vê amancê û baweriyê bo min vegêrandin tune. Bi van îşkencan we amanc daniye ku dest ji amancê û baweriyê xwe bikişînim. Le wun dixapînin; li baweriyê xwe ez naxapîm. Hemu

îşkence û lîdanên we li ber vê yekê wê pûç û betal bimînin. Wun hê derheqê min de tişt nizanin. Ev hal, pûç û bêhimî ya we dide nişandane.

Dibi ku ez serwest bim, bi zaneyî tevger vegirim. Taybetên tekoşin û partiyê her hûn li xebitî û bê guman biparêzim. Ji jiyana xwe pêştir bigrim, zanibim ku hebûn li ser van yeka ye. Bê va pûç û betale. Ev yek ji min re amanc e; *Bijî Serxwebûn, Bimre Qolonyalizm*. Ew ê ro yên mebin. Hatina me ye.

Wê gavê deng ji eywanê tî, tepe-repa lingê qerdiyan û dengê derban hêdi-hêdi pirtir dibe. Ku qerdiyan ciyên girtîyan li hev û du diguhîrin. Bi çêr û lîdana girtiyekî nûh tinin dixine hucre. Ser-merê wi hemî bi xwin e. Di nav xwin û binnan de wi li erdê dirêj dîkin. Eli ji hucre derdixin dibine yeka din.

Piştê ku qerdiyan diçin, bê dengiyeka giran çêdibe. Li eywanê ku tu şik namîne, li cem hucre Muhsin hedana Cahit namîne. Mina ku xwe bi diwêr ve zeliqandibe, hêdika devê xwe li diwar digre û bang dike.

Cahit- Keko, ha keko... çewa yî!

Muhsin- Başim.

Cahit- Ma lîdan pirtir kirin?

Muhsin- Neynê hişê xwe. Li ser nese.

Cahit- Hayate jê hebi ku Şemdin û Hesen girtine!

Muhsin- Na lo! Rast, ma rast e!!

Cahit- Hiş-hişşt. Deng tî! Migo Şemdin li hucre Eli dimîne. Wi danin wê. Bese dengê xwe neki. Hiş, bise.

Li ber eywanê çend qerdiyan û yuzbaşı bê dengî, bi dizi ber bi hucre wan ve tî. Hêdi-hêdi xwe di ber hucren de ditelinin û tî.

Ku Cahit tîdigihê ve leystikê, hê ku ew negihane nêzi wan bo ku hemû hucre pê bihisin ji nişkava radibe ser linga û bi dengêki bilind "Dikkat" dikişîne.

Yuzbaşı wana li ciyê xwe sar dibin ku leystika wan dipelişe. Bi awirên tuj û bi lez ber bi wi ve baz didin, tî.

Yuzbaşı- Ûla, ûla pûst! Ma ki got ku "komî" bikişîne, ki he... ki ji tere go...

Cahit- Wiha dizanim.

Yuzbaşı- Ka bise... ez ê nişanê te bidim. Ro jî min û te re hene, ka tu bise..!

Yuzbaşı û qerdiyan hêdi-hêdi li ber hucre digerin, hebo-hebo li girtîyan difekirin, bi hûr-bijari bala xwe didin wan. Û tî ber hucre Şemdin disekin; baş bala xwe didin; tu deng jê nayê.

Hişt, hişt çî diki lan; ûla tu çî diki! Ha wilo serê xwe rake ha! Ma tişt ji te dîkin? Na, na camêr tu tişt ji te nakin. Tu tişt nayînin serê te. Tu zila-

meki mezini wê çewa dest bavên te he.

**Li qerdiyan vedigere û jê re çav dişkine.**

- Ûla wun tişt ji vi nakin ne!? Wun tu tişt jê nekin ha herê! Car-bicar beqlewe-meqlewê bidinê: hay jê hebin erê..!

Migo ma tu dizani, mirov di jiyane de pîrr ji çi hizdike: çi şerine? Ma tu dizani he!? Ìhm.. mirov a pîrr ji jina xwe hizdike. Ma tu ji jina xwe hiznaki? Sibê- disub... he.. ma tu naxwazi ku ji vê derêyi...? He! Ku bersivên min bidi, tê ji vê derbikevi. Tu ji dibini ku derketina vê derê gellek hêsane. A awha hima tiliya xwe bileyzini ji tamam. Bi şeref sibê tu li dervayi. Her tişt xistûne destê min, her tişt. Destê min dirêje. Mêze serekê dewletê çar siet xelat daye. Yek ji van sieta daye min. Têdigihiji mana vê çiyê. Çiqas bi mane ye!? Bi rastî ji tu dişihubi zilameki bi aqil, camêreki baş. Mêze, ma zani ku ki te têxistûye vê derê!? Ki bû sebeb? Ki bu sebebê van yekan? Ki bu sebebê te?! Disa tu zani lê, ka li ser Hesên, Miheme, Qedri, Fatma, Genco û li ser Eli hin bifikre.. Li ser vana baş bisekine: wê gavê disa ezê bêm û emê bipeyivin, herê!

**Yuzbaşi û qerdiyan bi rûkeni derdikevin; mina li dû xwe şik hiştibin di ber hucran de derbasdibin û diçin. Di nav de çend bin derbasnave çawişek bi çend porteqalan tê dikeve hucrê.**

**Çawiş-** Ka mêzeke ibne! Va ez bûme navbenciyê te. Haşte vana yuzbaşi şandiye.. ji te re şand. Silavên wi ji hene. Ûla pûşt ma tu çiqas mezin bûyi he! Ma wun çi peyivin! Te çi ji yuzbaşi re gotiye, te çi got, çi?

**Şemdin-** Tu tiştêk.

**Çawiş-Êê,** van porteqala çima şand wê hingê?

**Şemdin-** Çi zanim ku çima şand.

**Çawiş-Êêê** wun bi hev zanin. Tu zani, ma ê min çi ye.

**Çawiş** porteqalan li cem wi belav erdê dike, û dertê. Derî digre û di qulika derî de lê dinêre, ka wê çi bike, bi xwe, an naxwe. Bala xwe didê ku Şemdin wa li hev kom kir û ani ber quncê derî de avête derva. Çawiş kulmên xwe lê dijdine û hêrs dibe.

- Ûla pûşt! Naxwî ne! Te nexwar ne! Çima te avête vê derê!? Yuzbaşiyê min şandibû..

**Şemdin-** Ma wun bi vana qey zarûkan dixapinin...?

**Çawiş-** Wa, wa ka çi dibê, ka lê fekre. Ûla ibne ka bise.. ka tu tu bise..!

**Bi çêr û gefan porteqala li destê xwe kom dike û bi lez dertê û diçe. Çend qas di nav de ku derbasnabe yuzbaşi tê, li ber hucra wî disekine.**

**Yuzbaşi-** Çewa... fikiri yi ne?

**Şemdin-** Tu tiştêkî ku lê bi fikirim û bêjim tune ye.

**Yuzbaşi-** Van çenda berê, çend kes çi kirine, çine, çi zanin. Puff hemû gotin, axivin, mi wana demexist mahekemê ji. Mina berxên bêşirmayî min wana rêkire mala wan. Şande cem dê û malîyê wan. Min

tiliya xwe ji, fitekek ji li pozê wan neda.

Tu ji ji neçari dibi ku li rêya filitandina xwe bigeri. Li vê rêyê bigeri. Ji ber vê dibi ku tu ji mera hin ûşt eşkere biki. Eli me biki. Oho va tu ji dibini ku jiyana vê derê gellek dijwar e. Nexasim ku jiyane nek aza li derva heye. Of of, ûla tu ji xwe tu ahmeqi. Bêhiş û bê aqilî. Piçek mêji di serê te de tune ye.

Li derva jiyane heye, jiyane. Mirov dilizin, dixwin, vedixwin, kêf dikin kêf. Hemû tiştên dilê xwe tinin, çi jiyane çi jiyane. Tu xwe ji vê jiyane xweş diki. Xwe dîr dihêli. Te tew, tew ma tu nabini niha ezê bigrim. Çavên min tiji bûn, dilê min li ser te dêşê. Ji xwe ez gellek dilşewatim. Dilêmin leqoke, dilê min van yekan nagre. Vê êşê ez ji te zêdetir dikşinim. Bi te di êşim. Bi rastî tu bi aqilî, dibe tu hatibi xapandinê, hatibi fen û leystikên kesian. Ma ji ber vê ne heyfa te ye. Ji ber xapandinê ne heyfa te ye. Ku di vi hali da yi.

Tiştê em dixwazim bide me. Wê gavê ku te ji vê derê demexim bila diyamin jina min be. Ku ez te ji vê demexim. Bila jina min sercika te be. Mêz ne mirov pîrîr ji jina xwe hizdike ne wilo? Ma hima bi serê xwe ji bêji "herê" ji mere bese û pirre ji. Hima ev tenê bese, hima ev îşaret tenê. Haydê bese û pirre ji.

**Şemdin-** Hewqas rûreş û rûşuştî nebin. Mirovê namûsîz bê şeref.

**Bi bersiva yuzbaşi nişka va xwe bi paş ve dikîşîne û reş û sor dimîne, qerdiyan tèn mina sehên har û dev bi gilêz êriş dikinê.**

## TABLO III

**Bi hilm û gulma hewa paqij çend car dike ku kuxika xwe bisekinine hew zêft kir û li ser-hev û du ji kûr ve kuxiya ta li hev mîna gopaleki xwar bû. Hêdi-hêdi çavên xwe rakir, li hawirdorên xwe fekiri. Ji ronahiya rojê demeki dirêj çavên xwe li ser hev jidand. Bala xwe baş da der-holên xwe û bê bal kişandinê gavên xwe hêdi-hêdi ber bi quncê meydanê ve avêt, û car bi car bi zorê kuxka xwe dida seknandinê. Hate ber Muhsin û pala xwe da diwar. Hêdi-hêdi li hawirdorê xwe fekiri û peyvê domandin.**

**Muhsin-** Heta neha ji hê ez eşkere nebû me. Lê, ev ji ne jibîr kirin ku eşkere bibe ji ne pêwîst e. Lê dîbi ku bala xwe ji vê yekê kêr nekim. Em kibin, çi kes bibin bila bin, di vê tekoşîna bê emsal de, taybetên parti û tekoşînê gere zerar nebinin. Ev ji hemû yekan pêştir e.

Dîbi ku qet nav nêr danê. Dîbi ku, em tîkîliyên xwe û derva bi hûr-bijari biparêzin, bi sitrinin. Veşari bigrin, ta tîkîliyên hundir ji. Dîbi ku haya me ji van hebe.

**Cahit-** Rast e. Gotina van yekan nehewce ye.

**Muhsin-** Disa ji nê jibir kirin, sistûya van çênebe, ji ber gellek tiştan ev hewce ne. Şahino yê xwe spar ji guman kir ku bi xayintûya xwe ew ê bifilite. Ji destê qolonyalista Tirk ew ê bifilite.

**Cahit-** Qolonyalist ji, xayîna mina destmaleki bikartin û davêjin ser sergo.

**Muhsin-** Mirovê bê xîret dikare sirêna partiyê û navan bide û daye ji.

**Cahit-** Mirovê bê namûs, bê şeref. Di diroka şoreş û dinê de tiştê wiha hene û kesên wilo derketine. Nexasim li welateki ku hemû rengê xwesipariyê mina pincek xwe li jiyana girtîbê û gerinca xayintiyê ku xwe di nav civakê de kemilandîye, tiştê wiha ew ê derbikevin. Kesê wiha ji ew ê derbikevin. Lê ew namûsîz...

**Muhsin-** Îşkence û zerpên girtûxanê hê girantir dikin. Xuya ye ku li vêderê yek kesekî serwest nahêlin. Naxwazin yek kesekî serwest bimîne. Li hember tiştên wê bîn û li diji van yekan dibi ku hin tişt bêne kirinê. Mina xûya dibi, tîkiliyên nav hevalan nerme û bi hemû rengan xwe nasitirine. Lehev ne civandîye. Tîkili sistin. Di demê kurt de li vê hêllê bibe sebebên çî yekan ji, dibi ku bi qawîşên din re tîkili lidarbênxistin û tevgersaziya nav qawîşa em bikemilînin. Ku girtûxane bibin nav a berxwedana.

**Cahit-** Bellê. Li vê derê ji tevgersazi dara hebûnê ye û ev tiştê çarenî ye.

**Muhsin-** Dixwazin tîkili û yekîtiya hevalan ji hev bipeleşînin. Tîkili û yekîtiya nav hevala dibi ku ji nûh ve bîne kemilandîne. Têgihîştina van yekan xurtir bibe. Ya din ji, di serî de li hember hoyên girtûxanê, bê berxwedan nayê jiyandinê. Bala me bi girani li ser vê yekê be.

**Cahit-** Ji berxwedanê pêştir rêyek tune ye.

**Muhsin-** Bellê. Mina tevgera me di bîşkifîne û daxûyan dîke. Ji pêşveçûnan xûyan dibe ku dewleta qolonyalista Tirk, boy ku hebûna xwe bidomîne bi hevkarîya CIA ber bi diktatorîyeka faşîst xwe bi kartîne. Tenê ev rê li pêş wê ma ye. Lê rehên wê ye hatîne birîne, tu quwet nikare wan jindar bike.

**Cahit-** Ji bo hevalên girtî li derva dibi ku xebat bêne kirinê. Avukat bîn girtin. Niha derxistina mahkemê rawestandî e. Lê wilo xûyane ku ew ê di demê nêz de dayên gurubi dest pê bîvin. Li hember vê bo parastina siyasî, bi hevalan re dibi ku tîkili bê danîne. Wê gavê ew ê karê me çibe? Em ê karibin çî bikin? Bersiva van pîrsa bê danîne. Hevkarîya bersiva çêbibe. Wê hingê ew ê haya van hevala ji jê hebe û ew ê xwe li ser vê yekê bikar binin. Xebatên xwe bikemilînin.

Ji bo revê: gere em bîne ser reva vê derê. Bi min be, bi ditîna min, derva derketîna te yî derva gellek girîng e. Hetta rêyeka çarenîne.

**Muhsin-** Lê hemû der mina qutîyê ye.

**Cahit-** Rêyeka wiha mirov biciribîne...

**Muhsin-** Çewa?

**Cahit-** Bi hevkarîyan hevalan li hember karbidestên girtûxanê propaxandek wiha çêbibe ku: selikên poxanê piçûkin. Hûrik-mûrik jê dikevin xwarê. Bila seliken mezin bidne me...

**Muhsin-** Êê. Hiimm...

**Cahit-** Tu ji dizani ku selikê poxanê girtî dibin û davên erebê. Û eskerên bêçek, an ji bêçekên hesan dibin û li ciyên dîr dirijînin. Ji me ra ev dimîne ku em te di selikê de bi cih bikin û vê bi partiyê bidne zandînin. Roj, cih, sîet û parolê ji ji wan re emê bêjin.

Bi vî awahî çara felatîyê zêde dibe. Belkî ev ji bo çend kesan zor be; lê berî her yekan dibi ku tu ji vê derê derbikevi.

**Muhsin-** Mêze. Hişş, wa faşîstê namûsîz, qerdiyanê îşkenceci tê. Hişşe û dengê xwe neke.

Qerdiyan bi vî ali-wî ali ve diheje, dilîtime. Sing-mingê wî vekirine. Çavê wî min a ji hêlinên xwe derketibin, dor wan reş bûne, çav lê sor bûye. Heeyt, heeyt ki bi çavreşî ji alîki ve li dewleta min, li dewleta Tirk difekire.. He ki, heyt ki ûlannn.

## TABLO IV

Qawîşekî tevlihev cîkrim sekîni ye. Li gotebêjê guhdar dikin. Ji gellek ditin û tevgeran kesan li hev civandîne. Yê xwesipar, xain, û yê dudil û nermok hemû li qawîşê civandîne.

Biranîna pîncîsaliya Atatirk e. Hemû der-doran bi fotografên Atatirk xemilandîne. Nivîs, wêne hundir tîji kirine. Fotografê Atatirk li singê xwe dane û ji kûr ve bala xwe dane gotêr.

**Astegmen-** Îro 10 ê Mîjdarê ye. Sîet ji neha pînc dibuhure. Îro roja Atatirk ku çûye gorbexşîyê. Jîyan, dirok, gera dinê sekîni, dil sekînin.

Ew qehremanekî bê emsal bû. Welatê me ji dijmin paqîj kir. Wan avête bahrê. Ku dijminan ji çar alî ve xistibûn dest. Wî, wî qehremanê mezin welatê me rizgar kir û daye destên me.

Em mîrxas û lawên atayên xwe ne. Wun dizanin ku wî çî digo? Digot ku "Tirk bedelê dinyayê ye".

Wa, wa! Hey, hey! Îhh.. çîma, çîma dikeni ûla. Ûla puşt çîma dikeni? Çîma kenîyayî puşt, çîma?

**Mistefa-** Nekenîya me.

**Astegmen-** Ka bis ez werim, ka, ka ha he çîma kenîya yî? He çîma...

Çîma ûla îbne; çîma dikeni he? Li xweşîya te diçe ne? Te geber bikim. Ûla ez ê te bikujim. Haş te hah, wiha bikevî ber sola min. Hah, hah, puşt wisa li erdê pij bibe ku hişê te bê serê te, ne ez ê te bi sêdarê ve daleqînim. Çewa ha haa, behîş ketî ne. Ezê wî hişî ji derbixim ka bise, ka bise...

Û wî li hember dijminên ku amanedikirin welatê me perçekin şerkir min a şêra, şer kir min a

pilingan. Wi şerkir. Ku em ji mîrxas û lawên wi bin em, welatên xwe naxin destên tu kesan û bi tu kesan nadin parvekirinê û em...

Osman- Qomitanêm, qom..., qomtanêminn...

Astegmen- Hişt, hişt, çi, çi ye lawo?

Osman- Ûff, ûff qomitanêmin. Ûff mîza mi qo.. qomitanê mi...

Astegmen- Hişt, ibne! Li ciyê xwe bimine. Ez bêm ez ê bi devê te de bikim. Li ciyê xwe be. Kes ne libite. Li hawirdorên xwe nenêrin. Cik tim! Hişt, hişt yek ji we tişt bike... yek tişteke beje... diyamin jina min be ez ê we di pelean de derbaskim...

Û em ê herdem li ser yê welatê me ji hev parvedikin mîna gurzan dakevin. Ata yê me rihet rakev(!) Em mîrxas û lawê qewma mezin û em bi navin. Bav û kalên me ji dinê re meydan xwen-

dine. Ji Asiya ta Ewropê hetta Afrika, herder yê me bû.

Di sala 1919an de Ata yê me derkete Sam-sûnê. Ala Tirk bilind kir. Li cebha şerq û xerbê şerkir. Û wana avête bahrê. Serê serekê serhildanên hundir û serhildana pelişand. Li ber komînzîzmê nermoke nebû. Fesal nedaye komînzîzmê. Û gotiye "li her derê bê ditinê serê komînzîzmê hûr-hûr bikin" û 1922an de cumhûriyetê ava kir. Vi welatî û vi mîletî bêveqetandin da destê me. Û em ê emaneta wî biparêzin. Tu neirse Ata yê me.

Heyy şîşt ka tu beje: Tu tu porsipiçolko, ka beje navê diya Ata yê me çibû?

Apê Eli- Wi wî, ev çiyê lawo?! Ew ji ku derket lawo, tiştê wisa min nebihist, û kes negotûye. Welle qomitanêmin bilmîrem.

(Dûmahik heye)

## "MA BILA MIRIN BI ŞEREF BE, LÊ SED Û HEZAR CAR BE!"

-2-

*Em vi qunci, bi serpehatinên yên ku taybet ji yana mirovî, welathîzî, gelêrî, şoreşgerî, xwebawerî, rizgarî û azadixwazî, herxwedan û biryarvanî hwd. didin zanandinê. Û bi biraninên ku di jîyanên me de quncên xas digrin bi hev re binexşin. Bikne quncê ji yana xwe. Ewê ev rûpel rolekî pêwîst bilize. Emê bûyer û biraninan bi pergalên çebûnî lê bi çirokî rêz bikin û manekirin û tegehîştina bûyer û biranina bi sipêrin xwendevanên heja û baldar.*

\*\*\*

Tepe-repa wan ji salonê qet kêm ne bû. Li her derên salonê borîn û qarîn dihatin. Şeqîn-reqîna zincîr û jopan bû. Ge li wur, ge li hêlla di, dengê nalin û sewtên girtûyan di nav tepe-rep û şeqîn-reqînan de dihat bihistin. Sar mam! Xweydaneka cemidî ta di serê neynokên min de avêt. Ji nişka va ricifim. Mina mûkên ser min tûj mabin, binek wilo mam. Xweydan li min cemidî. Mina birinên min ji nûh ve vebibin, ûrêjan li ser-hev davêtin.»

Tepe-rep: bere-bere nêzik bû. Bê hemd, damarên cênîk û pelegoşka min li ser-hev lê dan. Rewtelên refa îşkencê li pêş min sekinin. Bi awirên tûj, dar, jop û zincîrên xwe ta xwarê, bişkofên singê xwe vekiribûn. Mina gurên sebatê, serên xwe li min dirêj-kiribûn. Neserek, ne didu û ne sisê ne lingek ne çar û ne pênc û şeş; ne destek, ne jop û ne zincîrek.

Darên destên xwe, zincîrên peça-

yi li qevdên destê xwe zevt girti bûn. Zincîrê hêdi-hêdi li ranê xwe dide, bi awiran li min mêze dikin. Yek him benîştê xwe dicû, him bi dexesî mêze dike û cop li kefa destê xwe dide...

Bi awirên tûj notirvan hate ber min sekinî. "Ûla ibne tu zani iro çi ye? Ji ter dibêm lan! Îro çi ye? Bêje! Îro çi bû ye? Ûla puşt bersiva min bide...! Ûla qunde, Atatirk min ye ne! He, na! Ew nemirî ye. Îro 10 ê Mijdarê ye. Ka bêj, çi bû ye? Cihî-nimi ye ne?! Na ew gorbexş bû, dilşa bû."

Disa dar li min hejand û hêrsa xwe vereşiya: "ka tu bêj. Tu bêje ibne". Wi çend car li ser-hev got: min dengê xwe nekîr. Yê di ji ber bi min hatin, ku deng ji qoridorê hat, sekinin û gavek ji min dûr man. Û bala xwe dane milê rastê.

Dengê kûçikê hat. Xwe rastkirin. Bi dengên lîngan ve serekên refê îşkencê hatin li pêş min sekinin. Disa bû hewîna kûçikê, wan ji xwe rêz kirin. Ji nez borîna yuzbaşî Esat Oktay Yildiran, bi qoridorê ket:

"Ezê wilo lê bikim ku; ezê wisa binim serî ku; ezê mîna keran pê bidim gotinê... Çewa, çewa nabêje?!" Bi deng û kûçikê xwe "CO" va li pêş min sekinî. "CO" xwe li çimikên min bir û ani; wi werisê "CO" bi hêlla xwe va kişand. Rûkên xwe tîrş kir, serê xwe tewand û tûj-tûj li min fekirî. Lêva xwe tewand, gelpikên xwe tije kir. bi kef û tûka dev re, borîn pê ket: "Hee ma tu min nasnaki?! He, tu min qet nasnaki? Xwe dirêji nav wê

kefê bike... bikeve navê...! Xwe pê bişo, haydê zû! Ji gemara gû û mîzê tam bik, zû!"

Min qet dengê xwe nekîr. Destê xwe avêt pişt xwe, xwe qub kir, singa xwe werimand. Mina kûçikê har û dev bi gîlez, bi çav-sorî mêze kir, sekinî û di ber min de çû-hat. Rûkê xwe talotîrşo kir, gavek pêş va hat û got: "tu jina xwe nadi min? hee!" Min xwe civand serwext kir ku wê, iro dawîya îşkence û lêdanên mehan bi kuştina neha bine qeysa dawikê. Mina mîşên kewarê gume-guma serê min li goh û textê enî ya min da. Ma bila mirin bi şeref be, lê sed û hezar caran be!

Rabûm serxwe û min li nava çavên wi rihent û got: «malî ya min, durist û bi namûs e; bi xîret e; zane namûs çi ye. Lê tu; bi şev û ro, 24 seetan îşkence û lêdanê diki 'ji yana te ev dere. Lê, jina te di paşîla kî de ye?» Min xwe li benda derbên dijwar hişt ku refa îşkencê ji xwe libitand. Lê ji bini va qet tewr nedanî. Qermûçekên enîya wi vebûn, reş û sor bû, sist ma. Milên wi ber de ketin. Binek bê deng sekinî û ji nişka va dest bi Ataurkçî, Tirk'î, yekwelatî û netewatî kir. Di nav peyvê de disa ji nişka va borîya: "çima dikenî?" min deng nekîr û nekeniyabûm. Pêşî min bersiv ji nedî. "Bersiv bide, bersiva min bide!" Min ji jêra, hatina devê xwe got: «Li neçariya te dikenim.» Zûq ma, sar bû û hevsarê "CO" ji nişka va kişand û ji lez çû.

# ZMAN Û WÊJE YA NÎVÎSÎ

HÊL û zaneyên zman, derheqa ku zmanê Kurdî, şaxek ji quma zmanê Îndû-Ewrûpi ye wekhev difikirin.

Di alî nivîsandina zmanê Kurdî de demeke dirêj elîfbaya Ereban karhati ye. Dema Urartûyan, Mittani û Kassitan (ji berî miladi 1800 ta berî miladi 610an ev dem cih digre) ku nivisa Latîni tê ditin û ji Latîni kevintire gelê Kurd ji kitabeyan bi zmanê armeensî nivîsandîye. Zmanê li kitabeyan û li destûkên xeritan dinê nexşandîye ne zmanê ku dinav gel de tê xebitandinê ye. Di diroka mirovi de çewan felsefe, ilm û sin'et bê têgihîştina gel bi destên aristokrat û girseke piçûk hatibe xebitandin, û ev yekcan duri gel mabin, mina ku malê van girsan be, ev ji bo rojava Anadolê, Kurdistan û bo Rojhelata-Navîn ji wiha ye. Gelên ji qurnê salan ve hebûn domandine, berî miladi, ji sedsala 10an ve nivisa zmanê armeensî xebitandine. (Dîbi ku şaşî ji bo vê çenebe ku: tîkiliya zmanê armeensî û ya zmanê Ermeniya tune ye. Wekhev nêyi ditin)

Ku Încil despêk û bingeha miladi tê ditin nivîsandina Încilê ji bi armeensî pêk tê; di danezanên kevnare, destûkên qewartî û putan de nayê ditinê. Lewra ev yek ji bo netewên dinê ji wiha ye. Hê di dawîya salan de nivisa Latîni serdest ketiye. Nivisa zmanê armeensî li paş maye.

Her weke Roman û Grekî netewên cuda ne ji, eserên xwe yê zangerî bi Latîni nivîsandine pêvajoya karîna zmanê gelê li ser danezanan piştî Gûtîyan, Kassitan, Mittani û Urartûyan bûye barê Medan. Di danezanên dema Medan de pêkhatine, yên ku li ber destên hin danezanên Kurmanci di kitaba general Îhsan Nuri "*Koka Kurdan*" de daxuyan bûne. Piştî vê kifşkirina kurte-birî, ger em vegehin ser bingehê pirsgerêka xwe, ew ê bê yî ditin ku, bi elîfbaya Latîni destpêkirina nivîsandina Kurdî ji sedsaliya bistan ve destpêk bû. Li ser vê elîfbayê edîlandina zmanê Kurdî li Sûriyê di 15 Gulanê 1932an de bûye paya kowara "Hewar"ê.

Emîr Celaleddin û brayê xwe Kamûran Eli Demîrxan li ser sê amanca; zindekirina zmanê Kurdî, pêxistina zman û zanistîya zmanê Kurdî û bi amanca afirandina wêjeya gelî ji bo hêzkirina taybetên civata Kurd, xebatan kirine.

Kowara ku derdixistin "Hewar"

bi Fransîzi û Kurdî dixemilandin. Di nav nivîskaran de ji ronakbîrên Kurdê Sûri, yê Îraq û yê Urduê hebûn. Profesora Hevînd Serî, Eli Seydo, Doktor Ehmed Nafîz û Cigerxwîne navdar û Evdîlxalîk Eşîrî, Qedrican, Mustafa Ehmed Botî hwd. ji nivîskarê "Hewar"ê bûn.

Him di pêkanîna "Hewar"ê de, him salên dawî de di kitaba Kemal Badîllî "*Gramera Kurmanci*" de, him ji di ferhenga Yusuf Ziya Paşa "*Kurmanci-Tirki*" de elîfbaya Latîni hatîye karandinê. Di van eseran de elîfbaya Kurdî 31 herf kifş bûye.

Li welatên biyane, gramera Kurdî ji demên berê ve hatîye weşandinê. Neqla ewilî di sala 1787an de Gramera Kurdî li Roma'yê bi Îtalyanî çapbûye. Nivîskarê wê, mîsyonerekê katolîk e ku 18 salan li Diyarbekir jîyan domandî ye. Navê wî, MAURÎZÎO GARZANÎ ye. Di hêla filolojî de ji vi nivîskari re bavê Kurdolojî tê gotin.

Sala 1808a esera KLAPROUTH "*Xebaten Ser Kurmanci*" pêş me dibê. Disa ev nivîskar sala 1814a, fihîrîstek "*Gotinên Kurmanci*" derdixê.

Mîna em ji B. Nîkîtin hindîbin ku di destpêka sedsaliya 18an de HERBELOT, jîyana gelê Kurd ya gundîti li hev komkirîye. Û kronîgetek pêk anîye. Ku hin mîsyonerên Îngîlîzan tédigihên vê yekê çend nîmûnên kronîgê bi dest xwe dixin. Lê, dema General ŞÜSTELËN bajarê Erbilê sala 1828a ya tédixê destê xwe kitaxana Safewîyan û eserên Kurda di nav de dibê SAINT PETESBOURG'ê. Di nava van kitabeyan de nîmûneka ŞEREFNAMÊ ku di 1599an de bi destê nivîskarê wê disa di dest de derbasbûye û nişîa wî li bin heye û krogin ji di nav de ye.

Îro van eseran bi hemû zmanên nav dane çapbûne. Û hêlên zane ji gellek alîyan ve van eseran vejandine. Lê, mîna me li jorê got: Îro ev danezanan li hêviya balkêş û benda zana û ronakbîrên Kurda mane. Ev kronîga bê emsal jîyana gundîti gellek dewlemend civandîye. Esereka gel afirandîye. Û iro ev ji bo derbîkeve rûyê rojê bendewarê rizgarvanê xwe dimîne.

Li ser ŞEREFNAMÊ, nivîskarên Rûsî bala xwe jê kêr nekirine û bi balgirani li serê sekinîne. Em li vê binavê wî serfiraz dibin, dostê gelê Kurd VELIAMÏNOV-ZERNOV vê eserê

weşandîye. Endamê akademiyê F. CHARMOY ji, hemû jîyana xwe li vê yekê girtîye. Û ŞEREFNAME çar cildî va wergera Fransîzi çapkîri ye. Lewra wê hengamê zmanê Fransî zmanekê navnetewî bû. Ev esera bi Fransîzi çapbû ji alî hemû ronakbîran ve hat bişkavtîne. Ku, ronakbîrêkê biyane, hemû jîyana xwe daye ser wêje û çanda Kurdan, xebata wî ya bê emsal ji hemû xort û ronakbîrên Kurdan re nişane. Ku ev kes bixwe ne Kurd e ji.

Endamê Akademiya zangêra Rûsî, M. Lerch bi girtiyên Kurdê Rûsiya ve dixebite û di dirokê de neqla ewilî, bellê di dirokê de cara yekemîn rexnegira eserên Kurdî pêk tîne. Piştî vê yekê ve bişkavtîna û vejandîna DÏTTEL û BEREZÏN li dû hev berdevam dibin. Lê, di vi alî de danezan û neticên serfirazî pê bèn yên bi nişan A. LOZKO û JABA (herdû konsolosan li Kurdistanê wêzîfê pêk anîne.) anîne meydanê. Ji vana Jaba; xebat û danezanên afirandîye hewqas giranbûha û birûmetin ku navê wî dîbi bi herfên zerîn bêyi nivîsandîne û li dereca B. Nîkîtin bê ditinê. Û mîna B. NÏKÏTÏN ji hişê xort û xwendevanên Kurdan dernê. Ger em bêjin ji ber çî? Jaba, bi hevkarîya refek ronakbîrên Kurdan "*Bijarteyên Nivîskarê Klasîka Kurda*", "*Ferhenga Kurdî-Fransî*" kitaba axaftîne "*Fransî-Rûsî û Kurdî*" bikar anî ye (1848-1866). Di vê dema ku biyaneyên îdialîst li çand û zmanê Kurdî xwedî derdikevin, hêzên Tirk ji wêje û zmanê Kurdî re mezêl vedikin!

Piştî sala 1870 Prof. EGHÏAZARON li hêla Erivanê nav gelê Kurd, xebata Kurdolojî pêk tîne. (Ji sala 1870'yî ta 1982an ji xeynî Ziyadettin Paşa tu kesê zangêra Tirk li ser Kurdolojî Xebat nekiribe) Disa B. NÏKÏTÏN dibêje: "*Di vejandîna danezanên Kurdan de xebat û graniya Rûsiyan heye*". Ji ber, ronakbîrên welatên dijî ray li vê rastîyê tînin, ji zangêrên Elman'a, JÏSTÏ, PRÏM, SOLÏN û NAKAS'ê Avusturya nivîsên xwe ji bo weşandinê şandine akademiya zangêra Rûsiya.

Ji ber dor hatîye serê, em dixwazin vê yekê kifş bikin ku: di serîde akademiya zangêra Rûsiya xebata ronakbîr û balkêşên wayên filologê bi pezn û rûmetî bèn biranîn. Rûmet û biranîna karê wan ji me ra deynê mî-

rovi ye. Ev netîce, bawerîya zangêrî dide nişandane.

Kitaba HOUTUM-SCHINDLER "Alikariya Xezna Gotinên Kurdi" sala 1848-1888 li Leipzig'ê hatîye weşandinê.

Zangêrên Elman: M. OSCAR MANN, li ser wêje û zmanê Kurdi çar salan xebitî ye. (Ku her xortekê Kurdi ji her alî ve 4 salên xwe bide gel û welat wê welat xelas bibe!)

JARDIN û DRIVER'ê Îngilîz piştî şerê cihanê yekemîn, xebatên xwe yê vî alî daxuyanê hêlên zangêrî kirine. Ji xeynî vana sala 1913a xebatên SOANE li London "Gramera Kurdi" dertê pêş me.

Demên berê ji ber ku, ronakbirên Rûsya bi Fransî nivîs û weşanan karanine, sedemê van yekan ronakbirên Fransa, li ser vî alî xebatên kirine. BEÏDAR PAUL sala 1925 li Paris'ê "Gramera Kurdi" derdixê.

Mîna bi daxuyanê ji kifş dibe xebata xwe zmanê Kurdi piştî salê 1926an li hemû hêllên Kurdistan'ê firch dibe û bi girani tê domandinê. Lewra, van xebat û nivîskarên me daxuyan kir, xebatên wan li ser derdore hêllek Kurdistan'ê pêkhatî ye. Çara xebatên li ser hemû hêllên Kurdistan'ê bi dest neketî ye. Di nav van xebat û nivîsên li ser hêllan daxuyan bûne de, xebata MAKAS HOGO "Zmanê Kurdi de Zarê Mêrdinê" sala 1924an li Leningrad'ê çapbûye û ev, di nav xebatên hêllan de quncêki bi rûmet dadîgre. Disa vî nivîskarî, sala 1900î xebatên xwe yê vî alî bi navê "Bi Zarê Diyarbekir Zmanê Kurdi" li bajarê Elmanyayê HEÏDELBERG'ê weşandî ye.

Ji xeynî Turkiye iro li hemû navçeyên çand û hêlên cihanê şaxên Kurdoloji saz bûne. Li Moskova, Leningrad û Erîvanê, li Paris, Vîyana, Berlin, Stockholm, Londra û li Roma şaxên Kurdoloji xebatên xwe didomin.

Ji sedemê nivîsareka kurte-bire xebatên li ser zmanê Kurdi bi destên ronakbirên Kurd û biyanan berê û piştî şerê cihan a yekemîn ku li welatên îslam, Îran, Misir, Îraq û bi hindiki li Tirkîyê pêkhatine, em li vî van xebatan rêznakin. Xebatên li van welatan bi destên kedkarên Kurdan di bin zilm û zerpên giran de bi veşarî pêk hatine. Û ji ber xebata wêje, çand û zmanê Kurdi, girtin çêbûne û girtiyê vî alî di zindanan de şehîd ketine. Em wan bi serfirazî bir ûnin.

Disa bi kêmasîyan be ji ger em li ser vî rewşa dijwar bisekinin, aşkere ye, berî ku cumhûriyeta Tirkîyê saz bibe, ji sedsalan ve gelê Kurd û zmanê Kurda hebû û heye. Ger ne wiha bûna, ev kesên biyanan, li ser tiştekê tune bi salan xebatan nedikirin. Û mîna hin kesan hemû jiyana xwe nedidane serê. Ger gelê Kurd, wêje û zmanê Kurd, çand û sin'eta Kurdan tunebûne, hewqas qetliam, zerp û işkence, ew ê li hember kî û ew ê ji bo çi pêk bihatina? Çi sedem wê ji wan re bihatana ditinê?

Emperyalîst û zevtkarên kemalist û hêza domdarê wa yê îroyî a faşîst li Kurdistan'a Bakûr, nivîsandina zmanê Kurdi, weşanên Kurdi, qedexekirine û ev qedexekirin tenê ji bo zmanê Kurdi ye. Lewra iro li Tirkîyê, bi Fransîzî, Îngilîzî, Rûmî, Ermenî û bi zmanê Arnawûtî rojname tînen weşandinê. Van gel û kêman netewanan li dibistanên xwe dixwinin. Lê, gelê Kurd, ji van yekan dîre. Dîbi bê hişê mirovan ku, burjuvayê Tirk dema ray li weşanan tîne, ji ber ku kêrî çand û zmanên Tirkî tînen lohmanê. Lê, ji bo gelê Kurd ev rê ji girtî ye. Lewra ji demên buhurî ve û dema nû-buhurî nimûnên vî yekê gellek hatine ditinê.

Ji bo karaniya zmanê Kurdi, hevalên me yê şoreşger bist sal berê, kovarek Kurdi derdixistin. Bi zmanê Kurdi jiyana M. Kemal nivîsandin. Lê, xelata wê bû: 18 meh heps û 6 meh ji nefî...! Mîna xuyane ku ji mafên serceştên Tirkan rêya karaniya zmanê Kurdi ji tune ye. Ray li vî yekê ji nayanin. Pêkanîna weşanên bi zmanê Kurdi, dibe sedemê işkence û hepsa salan.

B. NİKİTİN: li hember vî mîna serhilde wiha dibêje: "bi zmanê demakî li Kurdistan'ê pêkanîna zangêrî û weşanan, sitara taybetên netewî û ji bo rêvekirin pêşveçûna gel ra ev rêyên çarenînin".

Dijmînê mirovani Hitler ji li welatên zevtkirî, peyvandina zmanê gel qedexe nekir û ji van netewên jêrdest karê pêşxistinê zman û çandê ne sitendibû. Ev rastiyeka gran e û dide nişandane ku kemalîsta, Hitler bi paşhiştîne û ji Hitler paştir û faşîsttîrin. Ev wiha ye. Lê, pêşveçûna dîrokê û hêza afirandina netewan nayê sekandin. Li hember van hemû desûk pûç û betal in. Ji dê, sitendina mafê welidandinê çibe, sitendina mafê sin'et û zman, wêje û çanda gel ji ewe.

Ji çîna serdestê feodalê Osmanîya ve ta dema kemalîstan, hemû karbidestên dewleta Tirk, tunekirina netewayê pîşî bi amanca wundakirina zmanê Kurdi dane pêşîya xwe.

Hember şoreşgerên Kurdan di mahkemên lihev-hatî û li mahkemên eskerî yê nemirovî de sala 1972an û sawciyên eskerîyê sala 1982a de sawciyên eskerî û sawciyên rûniştinê berî sitendina biryarê, êşkere tunehiya Kurdan diparêzin û ji bo zmanê Kurda idîa zmanê lihev-hatî di eywanên mahkeman de daxuyan dikin.

Ji bo vî pîrsgirêkê salê 70yî bersiva şoreşgerên Kurdan dane ku em binî birê, daxuyanên wana çewa li hev-hatiye wê eşkeretir bibe.

Universita Leningrad Enstituya Kurdoloji ferhengêka 35 hezar gotinî bi Kurdi-Rûsî derxistî ye.

Universita Sorbon dibistana bilind a enstituya Kurdoloji zmanê rojhilatê jindare ferhengêka 75 hezar gotinî bi Kurdi derxistî ye. Lê, ji salan ve ye ku sazgeha zmanê Tirkî ji sala 1969an ve bi 29 hezar gotinan ferhengê bi Tirkî derxistî ye. Ji van 29 hezar gotinan, 3 hezarên bi Tirkî, 6 hezaran yê edîlandî û gotinên biyane, 20 hezarê wan gotinan hemû gotinên biyana ne. Lewra: bi vejandina sazûmana zmanê Tirkî ev yek li ser ferhengê derketine meydanê ku:

Ji 1145 gotinên herfa (A) yê tenê, 328 gotin Tirkî ne, 346 gotin bi Erebi, 154 Yunani, 122 Fransî û 102 gotin ji bi Farisî ne.

Ji 1090 gotinên herfa (H) yê tenê, 184 gotin bi Tirkî ne, 565 gotin bi Erebi, 192 gotin bi Fransî, 82 gotin ji bi Yunani ne.

Ji 31 gotinên herfa (J), yek gotinek ji bi Tirkî nîne.

Ji 2214 gotinên herfa (M), 1514 gotin bi Erebi, 174 gotin bi Yunani, 134 gotin bi Fransî, 121 gotin bi Farisî ne. Tenê 117 gotin bi Tirkî ne, gotinên din bi Latîni, Îngilîzî, Îspanyolî û İbrani ne.

Ji 365 gotinên (Z), tenê 52 gotin bi Tirkî ne, 201 gotin bi Erebi, 90 gotin bi Farisî, 12 gotin bi Yunani, 5 bi Latîni, yek Rûsî, didu bi Ermenî û yek bi Fransîzî ye.

Ji zmanê Kurdi gellek gotin tevî zmanê Tirkî bûne. Mîna: çerçeve, çapraz, sehpa, hoşaf, pilav, peynîr, turşû, dûman, serkeş, herkes, çarşaf,



manda, sarhoş, zincir, û hê bi sedan gotinên din. Dawî şoreşgerên Kurdan ve nimûna xwarê delil didin nişandane.

## TC

### Diyarbakır, Siirt illeri Sıkıyönetim Komutanlığı Askeri Mahkemesi - Askeri Savcılığı

Diyarbakır: Evrak No; Esas No;  
Karar No;

Gotina serî de ji gotinên "Türkiye, Sıkıyönetim, Savcılığı, illeri" pêştir tu gotinên bi Tirkî tunene. Lê, nivîsa jorê ne ji çar gotinan çêbû ye. 16 gotin e.

Yanî: "Cumhuriyet, askeri, evrak, mahkeme, esas, karar" bi Erebi ne, "Diyarbakır (Diyarê Bekir)" bi Farişî, "Siirt (Sêrt) bi Kurdî û "Komutan ü No" ji bi Fransîzi ne.

Ku "Sıkıyönetim", "Savcılık" û gotina "il" ji hêlla sazûmana zmanê Tirk ve hatine edilandinê. Ta demên berê sazûmana zmanê Tirkî ji dêlva vana ve bi Erebi û Farişî "Ört-i idare", "Mudde-i Ümumi", "Vilayet" bikar diantî.

Ji sedemên rastîya li ber roje, ew sawcî û hakimên dibên; "zmanê Kurdî, lihev-hatî ye" bifikirin. Bila bifikirin çawa zmanê lihev-hatî hêrsbûnê ji nekşa wan derbikeve. Berî

generalên faşist bèn sazûmanê, Ecevit ê ku hêvi di hate nişadanê, dema serkar bû ma çi nedihate kirin? Dema li meydana Tandoxan xwe li kursi dihejand û ma ne ew bû polîsa gazi serkariyê dikir? Disa ne ew Ecevit bû jina xwe Rûşan dibezand ser şoreşgeran, bi dengê xwe yê mîna beqan alikariya polîs û eskeran dixwesta?

Sekreterê Ecevit, Mustafa Ustundax, ji ber li Mêrdinê îşkencê û ezîyetan li gelê me dikir alî PKK ve sûbayek hate cezakirinê, dema civata rojnamevanan de ma ne ew bû digo; "li Tirkîyê pîrsgirêka etnîka tune ye. Em ray li tiştê wiha naynin!"

Ha! Rake yek li êdî bixe!!

Serekê şaxa çandî a Komünist Partiya Fransa rojnamevanê navdar JAN VİDOL van li xwe eşkere dîke: "li Tirkîyê dema axavtina bi çepan re pîrs ku tê ser gelê Kurda, çand û sin'eta Kurdan û diroka Kurda, ew ên zaf ji wan bawerim, ji hemûyan wa, ji sedî notê wan, mîna ku min dit hemû dibîne mîna paşverûyên tari û hişk. Mîna hemû li ser tunebûna Kurdan yekdev bûbin!" Hêviya me ya ku ew çepên tene zman ku Jan Vidol bi wan re peyiviye kesên CHP bin!!! Ji ber van yeka me Ustundax, Ecevit û Rûşan nişan da.

Xortên Kurd! Ji bir nekin xwinrij Yaşar Degerli, Xwinxwarê Kurda

Fehmî Altınbilek, Esat Oktay Yıldiran, qisatê qirkirina 5000 xort û zarûyên Kurda Sadî İrmak, Süleyman, Ecevit, Rûşan û ferqa M. Alî Aybar qet ji hev tune ye. Ku dema tê gotin "gelê Kurd" heye, çavê wan û yên mîna vana ji hêlinên xwe dertên. Ji hêstrên çavê van tîmşehan neba-berbin û li wan nexapin.

Bê guman emperyalîst û karbides-tên burjuvayê zevîtkar bi hêzin. Lê ne bê binketinin. Bê hêvîti ne a zmanê. Ji her alî ve raste ku wêje, zman, sin'et û çanda Kurd dibin nîrê qolonyalîstî de ye. Hukumeta Norwêçê ji bo gelê LAPON (ku 25 hezar kes ninin), mafê radyo, televizyon û rojnamê nişan daye. Li Kurdistan'a Bakûr 18 milyon Kurd dîrî hemû mafî ne.

Lê, ev rastî heye, wê zmanê Kurdî, zincîra pêçayî bişkine û ji hev perçe-perçe bike. Mîna şoreşgerê Kurd dibêje: "ji bo em li hemû taybetên ESPERANTO kêrnehatî li ser kaxiz hate jibirkirinê! Zmanê Tirkî zmanê Kurdî, ji alî gel ve tîm xebitandinê û herdû zman, zmanên netewa ne. Hemberiya ve rastîyê tu feyde nade. Li ve hember sawcî û hakimî feyda gelê Kurd, erd û çand, wêje û zman û erdê jindariyê derbikevî û bi afirin, li dijî hemberên raweste, mirov û hêza tebiatê bi hemû hêza xwe li hember derbikevî"<sup>(1)(2)</sup>

## DAXWAZA ÇELO...

Çelo; karkerek ji karkerên Kurdistan li dervayî welat bi eş, û xwezi, bi dilek birin li gor qeysa xwe bi pergala welathîzî li pêkhatinên Kurdistanê gudarbû, bihist, dit û di vî alî de xebatan pêkanî, ta bihna xwe ya dawiyê di rewşa jiyana dervahî welat de pergala pîva jiyana welathîzî, bihûr-bijarî sitirand. Ew bi hiş û pêkanî xwe her roj, her gav, her bîh li nav gelê Kurdistan, li welat li cenga Kurdistan bû. Bi ve hilmsitandinê 9 ê Gulanê de çû rihmetê.

Ji ber bi ve dilxwazî û pergala pak, Çelo sala 1.7.1980yan de xwestin û dilê xwe deng dîke û ji «Dotmama Xwe ra» tîne zman. Em ê helbesta wî daxuyanên xwendevan û karkerên Kurdistanê bikin:

*Dotmam, min bihist disa dile te bi jan e  
Ew jan ji janeka giran e  
Ew jan xweş nabe bi bijisk û derman e  
Xweşkirina wê janê azadiya Kurd û Kurdistan e.*

*Dotmam ti kave guh bi de ser Iraq û İranê  
Herroj ten kuştin bi sedan lawên Kurdistanê  
Li jêr tank û top, li jor xwinjina şirokan e  
Lê, minet nakin ji dijmin daxwaz azadiya Kurdistan e*

*Dotmam, min bihist, disa girtin ser mala te  
Dijmin girtine herdû berxên te  
Herdû berxên te xwedikir bi şîrê berên xwe  
Destê wan girêdan li ber çavên te.*

*Dotmam ez îro gellek dilgeş im  
Li dû doza Kurdistan e ez ê her bimesim  
Ta ku dijmin ji hev bi pelêsim  
Bi pelîşandina dijmin tevgele xwe dilxweşim.*

*Dotmam Kurdistan li ber dile min gellek sêrin e  
Serxwebûna wê gellek dijwar e hêsan nîne  
Bê girtin, bê kuştin ji azadiyê ra qet çare nîne  
Divê bi girtin û kuştin dijmin çavên me netirsîne.*

*Dotmam, dixwazim li te bikim du şîretan  
Hevi dikim qenc tê guh bidî wan  
Ger herçar kurên min û te bèn kuştin ji  
Tu ji bi min ra bêje Biji Kurdistan!*

## BÎLÛRA MÎN

*Bilûra min a şîrîn  
Tu di sariya sibehê  
Û hingûra êvarê de  
Hevalê bêhevalan,  
Destbrayê şivan û dilketiyani.*

*Dengê te  
Hêstirên dilên xemgiran  
Silava ji hev-veqetiyên,  
Girîn û zarîna dilketiyên  
Tine bira min.*

*Bilûra min tu yî,  
Xemrevîna terkeserên dinyayên!*

*Dengê bilûra min  
Çiya û zozanên bilind  
Kaniyên bi gul û rihan dorgirtî,  
Guhê şikeft û serê zinaran  
Guhdarên te ne..  
Û sûra bayê xerbi  
Te di nav pelên darê de digeri ne.*


*Bilûra min, were em ê  
Bi wî çiyayê bilind re  
Bi hewa kevin,  
Û bibin ciranê bayên xurt  
Û hevalê kîmtên wan  
Yên bi mij û dûman,  
Û tê de dengê xwe berdîn,  
Û zarîna dengê me  
Bikeve nav kortal û geliyan  
Û bêcanîya erdên jêrîn  
Bihejîne;  
Û pêlên ava heftreng  
Û xemzebaz  
Nalîna me bigehîne  
Deşta Sirûç û Diyarbekrê;  
Û berîya mêrxasên Berazan;  
Û kalîna berxan*

*Tev şehîna hespan  
Li me vegeirînin.*

*Bilûra min, binêre û bibihîze!  
Roj çû ava,  
Stêra êvarê bû geş,  
Kolosên çiyên ên gewr  
Û hewranîyên wan ên sor û zêrîn  
Bûne çûn;  
Û pêlên ava şevê ên res  
Ketîne deşt û newalan  
Heta rûyê gir û kepezan.  
Di qereca de  
Kevir piyê şevgera dixapînin,  
Û bê dengîya şevê de  
Pêjna lingên mêrxasan tèn.*

*Bilûra min,  
Dengê xwe berde!  
Dinya: mîna zarokeki bersîr,  
Ket dergûşa xwe;  
Dengê xwe berde.. bilûra min...  
Û jê re bîlorîne,  
Xema wê birevîne!  
Bilûra min tu yî,  
Xemrevîna terkeserên dinyayê;  
Û li rohelatî  
Dema ku dinya hişyar dibe  
Ji xew radibe  
Ji me re  
Strana azahî û serbestiya  
Kurdistan'ê  
Binehwirîne  
Û dengê wê stranê, bila,  
Mîna tîrêjên rojê ên pak û zêrîn  
Bikeve nav dil û guhên me.  
Bilûra min,  
Tuyî xemrevîna dilketiyên welêt.*





**Hogir Mehmet, Kurdistaneka Serbixwe-Yekhev û Demokratîk,  
ku di vê rêyê de canê xwe da, wê sazbie;  
û navê te wê bi vê serpêhatinê re bijî**